Kurdiyat

e-ISSN 2717-8315

Yıl/Sal/Year: 2022 Sayı/Hejmar/Issue: 5

“Ji bo Bîranîna Salvegera Çilemîn a Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi 40. Yıl Anısına”

e-Ağ/Web: https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiyat

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİSTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Yayıncı/Weşanger/Publisher
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü
Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages

Sahibi/Xwedî/Owner
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Adına/
Li Ser Navê Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü yê/
On Behalf of Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages
Doç. Dr./Assoc. Prof. Abdulhadi TİMURTAŞ

Editör | Edîtor
Doç. Dr./Assoc. Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ
(Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University)

Alan Editörü | Field Editor
Arş. Gör./ Research Assistant. Mustafa ACAR
(Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University)

Kurdiyat - Yıl/Sal/Year: 2022 Sayı/Hejmar/Issue: 5

Lijneya Weşanê/Yayın Kurulu/Editorial Board

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Ayhan TEK	Muş Alparslan Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Hayrullah ACAR	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN	Bingöl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU	Dicle Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Dr. Öğr. Üyesi Ramazan TURGUT	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Dr. Öğr. Üyesi Zafer AÇAR	Bingöl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Öğr. Gör. Haci YILMAZ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey

Lijneya Şêwrê/Danışma Kurulu/Advisory Board

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ	Bingöl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Prof. Dr. Halit DEMİR	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Ayhan TEK	Muş Alparslan Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Hayrullah ACAR	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Kemal KAYA	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN	Bingöl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU	Dicle Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Kenan BULUT	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Dr. Öğr. Üyesi Ramazan TURGUT	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey

Sekreterya/Secretary

Öğr. Gör./ Instructor. Haci YILMAZ (Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University)

Dizgi/Rûpelsazî/Design

Erdal YILDIZ

İletişim/Têkilî/Contact Details

e-posta/e-Mail: Kurdiyat@yyu.edu.tr / yde@yyu.edu.tr
e-Ağ/Web: https://dergipark.org.tr/tr/pub/Kurdiyat
Tel /Phone: 0432 225 14 52
Faks / Fax: 0432 225 12 28

Adres/Navnîşan/Address: Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Yaşayan Diller Enstitüsü, 65080, Zeve Kampüsü, Tuşba/Van

Yayın Tarihi/Tarîxa Weşanê/Publication Date
Haziran/Hezîran/June 2022

Dergide yayımlanan makalelerin tüm sorumluluğu yazarlarına; yayın hakları ise Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü'ne aittir. Yayıncının izni olmadan kısmen veya tamamen herhangi bir şekilde basılamaz ve çoğaltılamaz. Dergi Yayın Kurulu gönderilen yazıları yayımlayıp yayımlamama konusunda serbesttir. Dergiye gönderilen makaleler iade edilmez. Yayın Kurulu ve editöryal ekip makalelerle ilgili herhangi bir yasal yükümlülük kabul etmez.

Berpirsiyariya meqaleyên ku di kovarê de têne weşandinê ya nivîskarên wan bi xwe ye. Mafê weşana gotaran jî aydê Enstîtuya Zimanên Zîndî ya Zanîngeha Wan Yüzüncü Yılê ye. Qismen yan jî bi tevahî, bêyî destûra weşanger tu gotar nayê çapkirin û zêdekirin. Lijneya Weşanê ya Kovarê di biryara xwe ya weşandin yan jî neweşandina gotarê de azad e. Gotarên ku ji bo kovarê hatine şandin bi şûn de cardî nayên îadekirin. Lijneya kovarê û Komîteya Edîtorî derbarê gotaran da mesûliyeta qanûnî qebûl nake.

All responsibility of the articles published in the journal belongs to the authors and the publication rights belong to the Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages. It my not be reproduced or reproduced in any form, in whole or in part, without the permission of the publisher. Editorial board of the Journal is free to publish and publish the articles. Articles submitted to the journal are not returned. Editorial board does not accept any legal liability for articles.

İçindekiler / Naverok / Contents

Editörden/Ji Edîtor/From The Editor ——— **6**

BERBERÎYA EVÎN Û NASNAMEYÊ Û REWŞA TRAJÎK DI ROMANA SÎYA EVÎNÊ DA ——— **9**

Sîya Evînê Romanında Sevgi ve Kimlik Çatışması ve Trajik Durum

Love and Identity Conflict and Tragic Situation in the Novel of Sîya Evînê

Mehmet Nur YAVUZER

TEWSÎF Û DANASÎNA KEŞKÛLA KURDÎ YA LI PIRTÛKXANEYA MECLÎSÊ ŞÛRAYÊ ÎSLAMÎ ——— **31**

İran Meclis-i Şûra-yı İslâmî Kütüphanesindeki Kürtçe Keşkülün Tavsifi ve Analizi

Description and Analysis of the Kurdish Kashkūl in the Library of the Islamic Consultative Assembly

Yakup AYKAÇ

ARİSTOKRAT KÜRT AİLELER: MÜKÜSLÜ ADİL BEG ——— **49**

Malbatên Kurd ên Arîstokrat: Adil Begê Miksî

Aristocratic Kurdish Families: Adil Beg from Mukus

İsmail KIRAN

الوجود الكردي في دمشق ودور الوجيه علي آغا زلفو ——— **71**

Hebûna Kurdan li Şamê û Rola Serbêj Elî Axa Zilf

The Kurdish Presence in Damascus and the Role of the Notable Ali Agha Zalfo

Ali SALİH

بيان حقيقة نسب الكرد في مصادر الشيعة والرد عليهم ——— **85**

Raveya Rastiya Binyata Kurdan di Çavkaniyên Şîîyan de û Bersivdayina Wan

Explanation of the Truth about the Kurdish Lineage in Shiite Sources and the Response to them

Charif MURAD

العقيدة والعبادة عندالييزيدية ——— **101**

Bawerî û Ibadet li Cem Êzîdîyan

Beliefs And Worship of Yezidis

Ahmed Sofi HAMD

Hekemên vê Hejmarê/ Bu Sayının Hakemleri/ Reviewers of The This Issue

Prof. Dr. Mehmet Zeki Duman,	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Doç. Dr. Abdulhadi Timurtaş,	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Doç. Dr. Hacı Önen,	Dicle Üniversitesi
Doç. Dr. M. Zahir Ertekin,	Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Hayreddin Kızıl,	Dicle Üniversitesi
Doç. Dr. Abdulcebbar Kavak,	Karabük Üniversitesi
Dr. Öğrt. Üyesi Hüseyin Ali,	Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi
Dr. Öğrt. Üyesi Cahrif Murad,	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Arş. Gör. Dr. Kenan Subaşı,	Mardin Artuklu Üniversitesi
Arş. Gör. Dr. Yaşar Kaplan,	Hakkari Üniversitesi
Arş. Gör. Dr. Şehmus Kurt,	Mardin Artuklu Üniversitesi
Öğrt. Gör. Dr. Lokman Şan,	Dicle Üniversitesi
Öğrt. Gör. Dr. Abdullah Sawas,	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Dr. Sevda Aktulga Gürbüz,	Diyanet İşleri Başkanlığı

Xwendevanên hêja!

Kovara Kurdiyatê bi hejmara xwe ya pêncan weşana xwe berdewam dike û xebatên têkilî kurdolojiyê pêşkêşî cihana akademîk û xwendevanan dike.

Di vê hejmarê de gotara yekemîn ji aliyê Mehmet Nur Yavuzer û Mehmet Emin Purçak ve hatiye amadekirin. Sernavê gotarê "Berberîya Evîn û Nasnameyê û Rewşa Trajîk di Romana Sîya Evînê da" ye. Lêkolîneran di xebata xwe de behsa berberîya evîn û nasnameyê û rewşa trajîk a rewşenbîrekî Kurd a di romana Mehmet Uzun a bi navê Sîya Evînê dikin.

Gotara duyemîn ji aliyê Yakup Aykaç ve hatiye amadekirin. Sernavê gotarê "Tewsîf û Danasîna Keşkûla Kurdî ya li Pirtûkxaneya Meclîsê Şûrayê Îslamî" ye. Li gor tesbîtên lêkolîner, di Kitabxaneyê Meclîsê Şûrayê Îslamî de keşkûleke bi sernavê "Dîwanê Şêxê Kurdî" hatiye dîtin û li gor qerîneyan li herêma Hekariyê hatiye nivîsîn.

Gotara sêyemîn a İsmail Kıran e. Lêkolîner, di xebata xwe ya bi sernavê "Aristokrat Kürt Aileler: Müküslü Adil Beg" de behsa Adil Begê Muksî û îtiraza wî ya li hember bêedelatiyê, dike.

Gotara çaremîn a Ali Salih e. Lêkolîner, di xebata xwe ya bi navê "الوجود الكردي في دمشق ودور الوجيه علي آغا زلفو/ *Hebûna Kurdan li Şamê û Rola Serbêj Elî Axa Zilfo*" de behsa Kurdên navdar ên li Şamê jiyane dike. Her wiha behsa xizmet û fedakariyên Ali Zulfo Axa yê ku bi eslê xwe ji Diyabekirê ye di civaka Şamê de kirî û rolên ku leyîstî dike.

Gotara pêncemîn a Charif Murad e. Sernavê gotarê "بيان حقيقة نسب الكرد في مصادر الشيعة والرد عليهم/ *Raveya Rastiya Binyata Kurdan di Çavkaniyên Şîîyan de û Bersivdayina Wan*" e. Lêkolîner, di xebata xwe de qala îdiayên di çavkaniyên Şîa de yên derbarê esil û neseba Kurdan de dike. Piştre ji gelek aliyan ve malûmatên di wan çavkaniyan de derbas dibin nîqaş dike û dinirxêne.

Gotara şeşemîn ji aliyê Ahmed Sofi Hamd ve hatiye amadekirin. Lêkolîner di xebata xwe ya bi sernavê "العقيدة والعبادة عندالیزیدیة *Bawerî û Ibadet li Cem* Êzîdîyan" behsa bîr û baweriyên Êzidiyan her wiha behsa îbadetên wan dike û berahvdaneke di neqeba îbadetên Êzîdîyan û dînên din dike.

Ji mijarên van gotaran jî diyar dibe; têkilî dîrok, sosyoloji, çand, ziman û edebiyata kurdan hêj gelek xebat hene divê bêne kirin û li benda lêkolîneran in. Bi rastî jî ev qad qadeke bi adan û bereket e û hêvî heye ew ê lîteratureke pir dewlemend înşa bike ku di cihanê de ew ê ciheke girîng bigire. Kovara Kurdiyatê jî yek ji wan berhem û saziyan e ku dixwaze di sazkirina vê lîteraturê de bibe alîkar.

Li benda xebat û lêkolînê we, bi hêviya hevdîtinê…

Doç. Dr. Haşim Özdaş

Edîtor

Değerli okurlar!

Kurdiyat Dergisi beşinci sayısıyla yayınına devam etmekte ve Kurdolojiye dair çalışmaları akademi camiaya ve okurlara sunmaktadır.

Bu sayıdaki birinci makale, Mehmet Nur Yavuzer ile Mehmet Emin Purçak tarafından hazırlanmıştır. Çalışma "Berberîya Evîn û Nasnameyê û Rewşa Trajîk di Romana Sîya Evînê da" başlığını taşımaktadır. Araştırmacılar çalışmalarında Mehmet Uzun'un "Sîya Evînê" adlı romanında bir Kürt aydının sevgi ve kimlik çatışmasını ele almaktadırlar.

İkinci makale, Yakup Aykaç tarafından hazırlanmıştır. Çalışma "Tewsîf û Danasîna Keşkûla Kurdî ya li Pirtûkxaneya Meclîsê Şûrayê Îslamî" adını taşımaktadır. Araştırmacının tespitlerine göre Meclis-i Şûra-yi İslamî Kütüphanesinde "Dîwanê Şêxê Kurdî" başlıklı bir keşkül bulunmuştur ve eldeki bulgulara göre bu keşkül Hakkari bölgesinde yazılmıştır.

Üçüncü makale, İsmail Kıran'a aittir. Araştırmacı "Aristokrat Kürt Aileler: Müküslü Adil Beg" başlıklı çalışmasında Müküslü Adil Beg'den ve onun adaletsizliğe karşı yaptığı itirazı konu edinmektedir.

Dördüncü makale Ali Salih'e aittir. Araştırmacı "الوجود الكردي في دمشق ودور الوجيه علي آغا زلفو/*Dimaşk'ta Kürt Varlığı ve Vecîh Ali Ağa'nın Rolü*" adlı çalışmasında Şam'da yaşayan meşhur Kürtleri konu edinmektedir. Bunun gibi aslen Diyarbakırlı olan Ali Zulfo Ağa'nın Şam'da yaptığı hizmet ve fedakarlıklarından bahsedilmektedir.

Beşinci makale, Charif Murad'a aittir. Çalışmanın başlığı şöyledir: "بيان حقيقة نسب الكرد في مصادر الشيعة والرد عليهم/Şia Kaynaklarında Kürtler" Araştırmacı çalışmasında Kürtlerin kökenine dair Şii kaynaklardaki iddiaları ele almaktadır. Daha sonra ilgili kaynaklarda yer alan bilgilerin yanlışlığını değişik argümanlarla çürütmeye çalışmaktadır.

Altıncı makale, Ahmed Sofi Hamd tarafından kaleme alınmıştır. Araştırmacı "العقيدة والعبادة عندالايزيدية/*Yezidilerde İnanç ve İbadet*" başlıklı çalışmasında Yezidilerin inanç ve ibadetlerinden bahsetmektedir.

Bu makalelerin konularından anlaşılıyor ki; Kürtlerin tarih, sosyoloji, kültür ve edebiyatına dair birçok çalışma araştırmacıları beklemektedir. Doğrusu, bu alan bereketli bir alandır. Bu nedenle bu sahada zengin bir literatürün inşa edilip dünyada hakkettiği yeri edinmeyi ümit edilmektedir. Kurdiyat Dergisi de bu literatürün oluşmasında katkı sunmak isteyen oluşumlardan biri olma arzusundadır.

Araştırma ve incelemelerinizi beklemekteyiz, yeni bir sayıda görüşmek dileğiyle…

Doç. Dr. Haşim Özdaş
Editör

Dear Readers

Here is the fifth volume of Kurdiyat Journal which is presenting some crucial studies to academic world and journal readers.

In the first article Mehmet Nur Yavuzer and Mehmet Emin Purçak argue love and identity of a kurd intellctual in Mehmet Uzun's novel named Sîya Evînê under the tittle of "Berberîya Evîn û Nasnameyê û Rewşa Trajîk di Romana Sîya Evînê".

Yakup Aykaç has written the second article of the journal which has got this tittle: "Tewsîf û Danasîna Keşkûla Kurdî ya li Pirtûkxaneya Meclîsê Şûrayê Îslamî". To this article, a small booklet named "Dîwanê Şêxê Kurdî" has been found in the Meclis-i Şûra-yi İslamî library. It is stated that this booklet had been written in Hakkarî region.

In the third article of this volume tittled "Aristokrat Kürt Aileler: Müküslü Adıl Beg", İsmail Kıran discusses a kurd individual named Adil Begê Miksî who has been known as a rebel against the unfair system.

The fourth article named "الوجود الكردي في دمشق ودور الوجيه علي آغا زلفو" is by Ali Sahih, in which he mentions about well-known kurds in Damascus. For instance he gives some knowledge about Ali Zilfo Axa and his crucial services and helpful affairs.

The fifth article is by Charif Murad which is under the tittle named "بيان حقيقة نسب الكرد في مصادر الشيعة والرد عليهم" . This article refers the Shitte sourches about the existence of kurds. The writer tries to disprove some informs about this subject with actual arguments.

The sixth article is by Ahmed Sofi Hamd. Hamd metions about Yazidi beliefs and worships in his article called "العقيدة والعبادة عندالیزیدیة".

It seems from the subjects of the articles of this volume there are many new plots such as history, sociology, cultur and literatüre which must be researched. This area is undoubtly fertile and it is hoped that the researchers study much to do a large academic literture. That is why the Journal of Kurdiyat has got an eagernes to create a countinous publish in a regular way.

We hope to see in the next volume with new articles.

Assoc. Prof. Haşim Özdaş

The Editor

Kurdiyat

Yıl/Sal/Year: 2022
Sayı/Hejmar/Issue: 5
e-ISSN 2717-8315
Doi: 10.55118/kurdiyat.1116823
Rûpel/Sayfa Page:9-29

BERBERÎYA EVÎN Û NASNAMEYÊ Û REWŞA TRAJÎK DI ROMANA SÎYA EVÎNÊ DA *

Mehmet Nur YAVUZER & Mehmet Emin Purçak

Kurte

Trajîka ku di puxta jîyanê û ya meriv da heye, xwe li ser meriv û bûyeran va dide nîşan. Trajîk; berberî, hilbijartina mecbûrî, wêranî û êşê dihewîne. Wek rastîyeke meriv trajîk, di dîrokê da zêdetir bala kesên ku bi felsefe, edebîyat, şano û hunerên dîtbarîyê va mijûlin kişandiye ku ew li ser trajîkê hûr bûne, wê lêkolîn kirine, herwiha trajîkê di berhemên xwe da dane nîşan. Kirûya trajîkê, di serî da di tragedyayên Yewnana kevn da cih girtiye, rihê wê serdema pirxwedayî û çarenûsa karakterên malmezin ya ku bi têkçûnekê bi encam dibû, di şanoyên wê serdemê da derketiye li pêş bîneran. Di serdema nûjen da, xêncî berhemên tragedyayê, ku girîngîya wan kêm bûye, bi taybet di romana ku rewacê da bû, bûyer, rewş û karakterên trajîk yên ku rihê serdema nûjen nîşan dane, derdikevin li pêş xwîneran. Ya ku trajîk e bi awayên cihêreng xwe nîşan bide jî, ew zêdetir di qada nirxan da û di berberîya nirxan da derdikeve der. Di rewşa trajîkê da kes, bi du nirxên erênî va ribirû dimîne ku divê yek ji wan hilbijêre, dema ku ji wan yekî hildibijêre, nirxa din ji holê radike û ev hilbijartina mecbûrî, wî/wê ber bi wêranbûnekê va dixijikîne. Evîn û nasname di cihana nirxan da du hêmanên girîng in. Evîn, hesteke xurt û bengî ya meriv e, ku ew ji bo meriv û jîyanê çavkanîyeke enerjîyê ye. Ew, di heman demê da nirxeke çêker û gihaner e. Nasnameya ku aîdîyetan dihundirîne, li ser bingeha cudatîyan, li ser kîbûn û ji kûbûna kes yan jî komekê radiweste, bi vî awayî kes û komê dide nasîn. Evîn, ku hesteke xurt û nirxeke bilind ya merivayetîyê ye û nirxên nasnameyî ku ji bo kes û komê girîng in, di serdema nûjen da wek du nirx û mijarên berberîyê, bûne çavkanîya derbûna puxta trajîk, ya ku di meriv da heye. Evîn û nasname du temayên sereke yên romanên Mehmed Uzun (1953-2007) in ku yek ji wan romanan *Sîya Evînê* ye. Romana *Sîya Evînê* rewşeke trajîkê dihewîne ku ev xebat di vê romanê da li ser berberîya du nirxan, ya evîn û nasnameyê radiweste, jînenîgarîya trajîk ya ronakbîrekî Kurd yê ku di navbera van herdu nirxan da maye, hilbijartinek kiriye û ber bi rewşeke trajîk va xijikîye hur dibe, rewşa trajîk ya ku di romanê da derdibe, radixe li ber çavan.

Peyvên Sereke: Trajîk, evîn, nasname, berberî, tragedya, roman, Mehmed Uzun, Sîya Evînê.

* Ev gotar ji sudwergirtina ji teza doktorayê ya Mehmet Nur YAVUZER ya bi navê "Nasname û Rewşa Trajîk: Berawirdkirinek Li Ser Romanên Mehmed Uzun, Yaşar Kemal û Îbrahîm Yûnisî" hatiye amadekirin.

Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types: Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research Article

Dema Hatinê/Makale Geliş Tarihi/Received: 14.05.2022
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/: 17.06.2022

Mehmet Nur Yavuzer Doktora Öğrencisi Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, İlahiyat Fakültesi
mehmetroniyavuzer@gmail.com
Orcid: 0000-0002-5648-5743
Mehmet Emin Purçak Doktor Öğretim Üyesi, Muş Alparslan Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi,
me.purcak@alparslan.edu.tr
Orcid: 0000-0003-1875-5842

Atıf: Yavuzer. M.N. - Purçak. M.E. (2022). "Berberîya Evîn û Nasnameyê û Rewşa Trajîk di Romana Sîya Evînê da", Kurdiyat, 5, 9-29.

Citation: Yavuzer. M.N. - Purçak. M.E. (2022). "Love and Identity Conflict and Tragic Situation in the Novel of Sîya Evînê", Kurdiyat, 5, 9-29.

Sîya Evînê Romanında Sevgi ve Kimlik Çatışması ve Trajik Durum

Öz

Hayatın ve insanın özünde var olan trajik, kendini insan ve olaylar üzerinden görünür kılar. Trajik; çatışma, zorunlu seçim, yıkım ve acıyı içerir. İnsana ait bir gerçek olan trajik, tarihte daha çok felsefe, edebiyat, sahne ve gösteri sanatları alanında çalışanları ilgilendirmiş ki onlar trajik üzerine eğilmiş, onu araştırmış ve trajiği kendi eserlerine yansıtmışlardır. Trajik olgusu, başta eski Yunan trajedi eserlerinde yer almakla beraber, dönemin çok tanrılı ruhu ve soylu karakterlerin bir yıkım ile sonuçlanan kaderleri, dönemin tiyatrolarında izleyiciler önünde sahnelenir. Modern dönemde önemi azalan trajedi eserleri haricinde, özellikle revaçta olan romanda, zamanın ruhunu yansıtan trajik olay, durum ve karakterler, okuyucuların karşısına çıkar. Trajik olan, farklı boyutlarda kendini gösterse de, daha çok değerler alanında ve değerler çatışmasında ortaya çıkar. Trajik durumda, kişi iki olumlu değerden birini seçme ile yüzyüze kalır, onun için önemli olan ve çatışan iki değerden birini seçmesi, diğer değerin yok olmasını beraberinde getirir ve bu zorunlu seçim, kişiyi bir yıkıma doğru sürükler. Sevgi ve kimlik, değerler dünyasında iki önemli unsurdur. Sevgi, insanın tutkulu ve güçlü bir duygusu olup insan ve yaşam için bir enerji kaynağıdır. O, aynı zamanda insanlığın yapıcı ve birleştirici bir değeridir. Aidiyetleri içeren kimlik ise, farklılıklar temelinde bir kişi veya bir grubun kim ve nereden olduğu üzerinde durur, böylece kişiyi ve grubu tanıtır. Güçlü bir duygu ve insanlığın değeri olan sevgi, kişi ve grup için önemli olan kimliksel değerler, modern dönemin çatışan iki değeri ve konusu olarak insanda var olan trajik özün görünmesine kaynaklık eder. Sevgi ve kimlik Mehmed Uzun (1953-2007) romanlarının iki önemli temasıdır ki o romanlardan biri *Sîya Evînê* dir. Bu çalışma trajik bir durumu içeren *Sîya Evînê* romanında, çatışan iki değer olan sevgi ve kimliği irdelemekte, bu iki değer arasında bir seçim yapıp trajik bir duruma sürüklenen bir Kürt aydınının biyografisi üzerinde durmakta ve romanda gerçekleşen trajik durumu gözler önüne sermektedir.

Anahtar Kelimeler: Trajik, sevgi, kimlik, çatışma, trajedi, roman, Mehmed Uzun, Sîya Evînê.

Love and Identity Conflict and Tragic Situation in the Novel of Sîya Evînê

Abstract

Tragic, which is inherent in life and people, makes itself visible through people and events. The tragic includes conflict, forced choice, destruction, and pain. Tragic, which is a human fact, has mostly interested those who work in the fields of philosophy, literature, performing and performing arts, who have focused on the tragic, researched it and reflected the tragic in their own works. While the tragic phenomenon is primarily in the works of ancient Greek tragedy, the polytheistic spirit of the period and the fates of noble characters resulting in a destruction are staged in front of the audience in the theaters of the period. Except for the tragic works whose importance has decreased in the modern period, the tragic events, situations and characters reflecting the spirit of the time, especially in the popular novel, appear before the readers. Although the tragic manifests itself in different dimensions, it mostly emerges in the field of values and in the conflict of values. In the tragic situation, the person is faced with choosing one of two positive values, choosing one of the two important and conflicting values brings about the destruction of the other value, and this forced choice drags the person towards destruction. Love and identity are two important elements in the world of values. Love is a passionate and powerful human emotion and is a source of energy for people and life. It is also a constructive and unifying value of humanity. Identity, which includes belonging, focuses on who and where a person or a group is from on the basis of differences, thus introducing the person and the group. Love, which is a strong emotion and the value of humanity, and identity values that are important for the individual and the group, are the source of the tragic essence of the human being as two conflicting values and subjects of the modern period. Love and identity are two important themes of Mehmed Uzun's (1953-2007) novels, one of which is *Sîya Evînê*. This study examines the conflicting values of love and identity in the novel *Sîya Evînê*, which includes a tragic situation, focuses on the biography of a Kurdish intellectual who has made a choice between these two values and is dragged into a tragic situation, and reveals the tragic situation in the novel.

Keywords: Tragic, love, identity, conflict, tragedy, novel, Mehmed Uzun, Sîya Evînê.

Destpêk

Romana *Sîya Evînê* jîyana karakterekî dîrokî ya Memduh Selîm Begê vedibêje. Ev nivîsar di romana *Sîya Evînê* ya Mehmed Uzun da li ser pirsgirêkên nasname û evînê radiweste, nirxên ku dikevin di nav berberîyê kifş dike û li ser rewşa trajîk ya Memduh Selîm Beg, rewşa dijwar û êşdar ya serdema wî lêkolîn dike.

Rewşa trajîk ya meriv, di serdema pêşîn li Yewnana kevn da, bala helbestvanan dikişîne û ew vê rewşa ecêb ya meriv dînin qada hunerê û vê rewşê bi hunerê şênber dikin. Di wê serdemê da ji alîyê helbestvanan tragedya tê nivîsîn û li hemberî bîneran va tên lîstin. Çawa ku huner wek neynûka civakê hatiye dîtin, berhemên tragadyayê yên wê serdemê sîtava rewşa serdemê ye. Di serdema nûjen da rewşa trajîkê di romanê da cihê xwe digire. Romanûs, di deqên xwe da rêzebûyerên trajîk dihonin, bûyer û karakterên trajîk saz dikin. Wek romanûsekî edebiyata Kurdîyê Mehmed Uzun jî di romanên xwe da cih dide bûyer û karakterên trajîk ku yek ji wan romanan *Sîya Evînê* ye. Romana Mehmed Uzun ya *Siya Evînê* romaneke jînenîgarîyî ye. Temayên vê romanê, evîndarî, pirsgirêkên nasnameyê û rewşa trajîk in. Navê romanê, ji helwesta rewşenbîrekî ku li sirgûnê xwe daye li ber sîya evînê, evîneke têkçûyî digire. Roman, li ser jîyana karakterekî dîrokî, ronakbîrekî Kurd û têkçûna rewşenbîrekî sirgûn hatiye honandin. Ev roman, serpêhatîya jîyana trajîk ya Memduh Selîm Beg (1892-1976) vedibêje. Di romanê da ew wiha tê nasandin:

Delaliyê bav û kalikê xwe. Xortê bejnzirav yê bajarê kevn û rengîn Wanê. Efendiyê xortên kurd yên Stenbolê. Pêxasê meyxanên Galatayê. Dilovanê dengên xweş. Hosteyê araqvexwarinê. Yek ji damezrevanên Komela Xwendekarên Kurd li Stembolê, **Hêvî**, 1912. Nivîskar û berpirsiyarê kovara **Jîn**'ê, 1918-19. Yek ji damezrevanên rêkxistina kurdî Teşkîlatê Içtimaiye û Kurd Tealî Cemiyetî. Aware û derbederê welatê xerîbiyê. Dildarê evînê. Xwediyê kevokên aşqê. Û niha jî yek ji damezrevanên partiya Xoybûnê. Ronakbîrekî nûjen di navbera Rojhelat û Rojava de. Yanê Memduh Selîm Beg (Uzun, 2005: 83).

Têkilîya dîrok û trajedîyê heye ku di bûyerên dîrokî û serpêhatîyên kesayetên dîrokî da rewşên trajîk tê dîtin. Ev wek agahîyên dîrokî di dîrokê da hatine tomarkirin û ji bo nivîskaran jî dîyardeyên girîng in ku nivîskar van bûyerên trajîk bi hunera xwe va dirûvandine û bi deqên edebî va veguherandine. Wek nivîskarê romana *Sîya Evînê* Mehmed Uzun, bûyereke trajîk û karakterekî trajîk ji dîroka nêzîk derdixe û ji wan romaneke ku trajîkê dihewîne, sazdike. "Carinan behsa kesayetên dîrokî, carinan jî behsa trajedîya welatek yan jî neteweyek tê kirin. Carinan jî behsa trajedîya kesayetekî/ê dîrokî bi navê netewe yan jî welatê ku temsîl dike va tê ziman. Trajedî, di nav dîrokê da serpêhatîyên serokên têk çûne yan jî qederên tevgerên sîyasî yên bi vîn, bi dest dixe. Di van serpêhatîyan da dema ku dengê zengilê mirinê hatîye, qey dibêjî trajedî û dîrok kelijîne (Poole, 2013: 29-32)." Dîroka Kurdan bûyer û karakterên trajîk dihewîne ku Mehmed Uzun ji wan sûd wergirtîye û romana Sîya Evînê li ser wan agahîyên dîrokî sazkiriye.

Romana *Sîya Evînê* di heman demê da derbirîna derûnîya neteweya Kurd ya serdema Memduh Selîm Beg e. Di romanê da ji alîyekî va rewşa trajîk ya Memduh Selîm Beg heye, di alîyê din da jî rexneyek li ser pergala nû ya Komara Tirkîyê û mêtîngerên cîhanê heye. Uzun, bi vê romanê, li ser rewşa trajîk ya Memduh Selîm Beg, rewşa trajîk ya gelê Kurd ya serdemekî jî radixe li ber çavan û çarenûsa karakterê trajîk û ya gelê wî bi hev va girêdide. Serdema Memduh Selîm Beg ji alîyê nasnameya etnîkî-neteweyî va, serdemeke dijwar e, herwiha "dema jîyan û têkoşîna Memduh Selîm demeke hesas e, girîng e, çetîn e (Polat, 2021: 76)." Ya ku trajîk e, di dem û rewşên dijwar û çetîn da rû dide. "Di serdema Memduh Selîm Begê da desthilatên serdemê bi rê rêbazên

tûnd û nijadperest li ser Kurdan da diçin, rêvebirên komara nû yên ku desthilatîyê bidest dixin, kes û komên bilî xwe ditepisînin. Rewşenbîrên Kurd jî ji vê bêpar namînin, Di komara nû da cih li rewşenbîrên Kurdan ra tê teng kirin û ji bo wan sirgûn destpêdikin. Di enecama van pêngavên rêvabirên komarê da ji bo Kurdan dîmenên trajîk dertên. Yaşar Kemal ji bo vê romanê dibêje; "ev roman trajedîyek e" (h.b.: 77)."

Uzun, di vê romanê da cih dide evîna Memeduh Selîm Beg û Ferîhayê. Du kesên ji etnîkên cuda ji ber nasnameyên xwe ji welatên xwe direvin tên Antakyayê û li xerîbîyê rastê hev tên û dil berdidin hev. Bavê Ferîhayê dixwaze ku dewateke bi rew û rêzên Kurd û Çerkezan bê pêkanîn û dengê dewatê bigihînin pergala nû ya Komarê. Uzun, bi vê helwesta bavê Ferîhayê û dildarîya ji nasnameyên cuda, rexneya ramana "yeknetewe û yeknasname"yê ya Komarê dike û pirengîyê diparêze. Ew, bi berberîya dil û mêjî ya ku di derûnîya Memduh Selîm Beg da diqewime, rewşa trajîk ya wê serdema stemkar dide nîşan. "Tragedya, têgihîştina êşa merivayetîyê ye (Bonnard, 2006: 11)" ku Uzun bi vê deqa trajîk dike ku êşa ku ji ber pirsgirêkên nasnameya etnîk û neteweyî tê jîyîn bide nîşan.

1. Nasname

Meriv, ji roja pêş heta vê gavê li pey xwenasîna xwe ye. Meriv dixwaze xwe nas bike, li pey bersiva "ez kî me? digere, piştra li pey wateya xwe digere, lêpirsîna cihê ku lê peyda bûye dike û li ser bersivên "ez çi me û ji bo çi li vê derê me? diponije. Ev demajo, derî ji lêgerîna nasnameyê ra vekiriye. Nasname, xwegerîn û li xwe vegerîn e. Fîlozofê Alman Martin Heideger dibêje; "merivê heyî, naxwaze bes bi hebûna xwe bimîne, di heman demê da daxwaza zanîn û berpirsîyarîya 'kîbûn'a xwe jî dike (Sözen, 2019: 13)." Maalouf dibêje, "nasname, ji gotina Sokrates "xwe nas bike" bigire heta Freud, wek pirsgirêkeke sereke ya felsefeyê ye (2000: 15)." Zanistên felsefe, derûnînasî û civaknasî bi nasnameyê va têkilîyeke nêzîk danîne. "Felsefe ji mêj va ne di warê rewişt û ontolojîyê da bi têgiha nasnameyê va pewendîdar e. Lê derûnînasî zêdetir xwedî li vê têgihê derketiye û wek kirdeyek li ser meriv rawestîyaye. Civaknasî jî balê kişandiye di navbera têkilîya kes û civakê (Özdemir, 2001: 108)." Meriv, xwedîyê nasnameyekê ye û her tim pirsgirêka nasnameyê jîyaye. Herwiha nasname jî her tim di nav pêkhatinê da nin û bi hîç awayî meriv nikare behsa nasnameyeke ku xwe temam kiriye û gihîştiye dawîyê bike.

Nasname têgiheke gelek berfireh û xwedî lîteratureke gewre ye. Di nav demajoya dîrokî da gelek zanist têkilî bi nasnameyê va danîne, bi demajoya modernîzm û postmodernîzmê va jî ew bûye têgiheke cihêreng û sereke. Nasname, bi pirs û raveyên kes yan jî civak çawa tê dîtin, xwe çawa dibîne, xwe di nav hengam û helwesta heyî da çawa cîwar dike, ez kî me / em kî ne, çawa me / çawa ne û ji ku me / ji ku ne? va têkil e. Têgiha nasnameyê ji alîyê lêkolîneran va wiha hatiye ravakirin: "Xweravekirina kes yan jî komekê û xwecîwarkirina di nav kes yan jî komên din e (Bilgin, 2007: 11)." "Nasname, bersivên kes, kom, civak û civatan ji bo pirsa "hûn kî ne, ji kê ne?" ye (Güvenç, 2010: 3)." "Nasname ew têgih e ku kesek, civakek yan jî neteweyek xwe çawa dibîne, di nav dîrokê da yan jî civakê da xwe çava cîwar dike, rave dike. Wekhevî û cudatîyan nîşan dide, taybetiyên kesê yan jî yên neteweyê di xwe da dihewîne. Nasname di demajoya dîrokê da pêk tê, vediguhere, ji duh heta îro, ji îro heta siberojê pêkhatina xwe didomîne û livdar e (Ji Sözen neql. Alver, 2006: 31-33)." Têgiha nasnameyê di zanistên civakî da ji bo têkilîyên kes û civakê were ravekirin di salên 1950'an da bi avayekî zêde tê bikaranîn û ev têgih bi pirsen "ez kî me" û "ez aîdê kû derê me" va têkil e (Ji Gleason neql: Dalbay, 2018: 162-163)." Weeks dibêje; "nasname pirsgrêkeke aîdbûnê ye, ya ku hevparîya we bi merivên din ra çi ne û çi we ji yên din cudatir dike. Em hemû di xwe da bi gelek nasnameyan va dijîn, lê di nav van da em ê kîjan derxine pêş, li ser

kîjanê hûr bin û bi kîjanê va wekhevî/mînanî bin, bi gelek hincetan va girêdayî ye (1998: 85).”

Nasname, ew têgih e ku hem li ser takekesê û hem jî li ser komê radiweste. “Li ser kategorîyên nasnameyê lêkolînerên mîna Turner, Stryker ve Burke agahî dane ku em dikarin wan bi giştî wiha dabeşînin: Nasnameya Takekesî, Nasnameya Civakî (çîn-eşîr-netewe-omet û hwd.) û Nasnameya Gerdûnî (Nasnameya Merivayetîyê) (Öztürk, 2007: 8).” “Nasnameya civakî ji nasnameya takekesîyê cudatir e. Heke em çawanîyên ku me ji yên din vediqetîne, tevgerên xwe yên giştî, keseyat, raman, daxwaz û hezkirînên xwe esas bigirin û xwe bi van va rave bikin, tê wê wateyê ku em di nav nasnameya xwe ya takakesîyê da digerin. Wek mînak: ez merivekî xweşbîn û dilpak im. Lê heke em xwe wek endamê komekê, bi çawanîyên xweser yên endemên komê rave bikin, wê gavê em behsa nasnameya xwe ya civakî dikin. Wek: ez jin im, mêr im, tirk im, elewî me û hwd. (Demirtaş Madran: 2012: 77)”. “Teorîya nasnameya civakî ji alîyê Tajfel û Turner va di salên 1970’an da hatiye sazkirin ku ew li ser têkilîyên komî û yên di navbera koman da radiweste. Di çarçoveya derûnîya civakî da li ser vê demajoyê disekine. Ji alîyê têgihîştinî û hişmendîyê va li ser endamtîya komê hûr dibe û wateya ku takekes barê vê endamtîyê kiriye li ser bingeha hestên hevratî û aîdîyê danîye. Ev teorî ‘embûn’ê wek têgiheke derûnîyê ya ku aîdîyetê dihundirîne, li ber çavan digire (h.b., 2012: 73).” Nasname di nav demajoya dîrokê da ji ber şert û mercên nû, dirûvên nû girtine, guherîne, derketine holê, herwiha ji alîyê kes, sazî û desthilatdaran va hatine dirûvandin. Weeks dibêje; “polîtîkayên nasnameyê di dawîya salên 1960’an ji alîyê tevgerên civakî yên nû û ji bo wan tên kifşkirin ku wekî: tevgera reş, feminîzm, lezbiyen, azadîya hevzayendîya mêr xwe nîşan didin. Niha pirsgrêkên nasnameyê di navenda polîtîkayên nûjen da ne (1998: 86).”

Di demajoya dîrokê da meriv bi pirsgirêkên nasnameyê va rû bi rû mane, carinan wan çareser kirine, carinan jî pirsgirkên nasnameyê bûne sedemên rewşên dijwar û êşdar. Berberîya nasnameyan gelek caran ji ber cudatîyên cureyên nasnameyan û aîdîyetên cuda derhatine. **“**Nasname ne bêalî ne. Li piştê lêgerîna nasnameyan da piranî nirxên cuda û yên di nav berberîyê da nin hene. Dema ku em behsa ‘kîbûn’a xwe dikin, di heman demê da em dikin ku ‘çibûn’a xwe, bawerîya xwe û daxwaza xwe jî vebêjin. Cudatîyên derbareyê van, ne tenê di navbera civakên cuda da, di heman demê da di nav hundirê takekesê da jî wek nakokî cih digirin (Weeks, 1998: 86).” Maalouf li ser kujerîya nasnameyan radiweste. Ew xebata xwe li ser pirsa: Çima îro ewqas meriv ji ber nasnameyên dînî, nîjadî, neteweyî û nasnameyên din kuştinê dikin? ava dike. Kesên ku gefê li ser adîyeta xwe ya dînî dibînin, bes aîdîyeta dînî wek nasnameya xwe nîşan didin, ango gef li ser zimanê zikmakî û nijada wan be, wê demê aîdîyeta wan ya nijadî derdikeve pêş û nasnameya xwe li ser vê aîdîyetê dîyar dikin. “Tirk û Kurd misilman in, lê zimanên wan cuda ne; ma gelo şerên wan ji ber aîdîyeta wan ya hevpar bêtir bê xwîn e? Hutuyî mîna Tutsîyan katolîk in û bi heman zimanî diaxivin, ma ev rewş pêşî li hevkuştina wan girtiye?” Maalouf dibêje; yek nasnameya meriv heye ku ew ji gelek aîdîyetan pêk tê. Divê meriv him aîdîyetên xwe û him jî yên kesên din bipejirîne û ji wan ra rêz bigire ku ji alîyê nasnameyê va rewşên neyînî di navbera merivan da derneyên. Ew, li ser nasnameyên zikmakî û yên ne zikmakî ne radiweste û dîyar dike ku zêdetirên nasnameyan ne zikmakî ne. Nasname, di bin kerîgerîya gîyana demê, di nav jîyana domdar da pêk tê û diguhere. Dema ku di nav hemû aîdîyetan da bes yek aîdîyet bi nasnameyê va wekhev tê dîtin û wê dadînîn navendê, li gorî şert û mercên wê demê wê aîdîyetê derdixin pêş û wê dikin aîdîyeta binghehîn, hingav ew di xwe da xetereyek dihewîne. Maalouf, li dijê vê derdikeve û rewşa, bi yek aîdîyetê va rawestana li ser nasnameyê, wek ‘nasnameya mirinbar’ dide nasîn. Dema ku meriv aîdîyetên pirayî yên xwe û yên dijî xwe bipejirîne, wê demê helwesta hişk ya ku wek ‘em’ û ‘ew’ xwe derpêş kiriye, yê ji holê rabe. Ew kesên ku aîdîyetên pirayî di xwe da mihandine û wan dijîn, yê di navbera çand û civakên cuda da bibin pireyek û ji alîyê aîdeyetên pirayî li ser civaka xwe

jî rewşeke erênî pêk bînin (2000: 15-29).” Bi vî awayî Maalouf ji bo ku pêşî li ber berberîyên nasnameyan bigire, li dijî nasnameyên mirinbar rêyeke çareserîyê pêşkeş dike.

Xêncî zanistên felsefe, civaknasî û derûnînasîyê, edebîyat jî bi nasnameyê va mijul e. Edebîyat e ku ew li ser nasnameyê hûr dibe û ew di avakirina nasnameyê da xwedî cihekî girîng e. Edebîyat, li ser avakirinên nasnameyên mîna nasnameya neteweyî, nasnameya dînî, nasnameya çandî, nasnameya sîyasî û ya zayendî kartêker e. Herwiha berhemên edebî wek neynûkekê, nasnameyên civak û kesê nîşan didin û şahidîya guherîna nasnameyan dikin. “Nivîskar wek kesek ji endamê/a civakê ji rastînîya civaknasîyê bandor digire û berhema xwe dinivîse. Ev rewş nîşan dide ku edebîyat rasterast ji paşxaneyek û li ser bingeha çandî peyda dibe (Alver: 2006: 35).” Edebîyat, ji bo nîşandan û sazkirina nasnameya neteweyê roleke sereke dihewîne. Jusdanis dibêje:

Edebîyat neynûka xeyalî ye, ku merivên endemên neteweyê xwe di wê da nîşan didin. Edebîyat hem nîşandêr e û hem jî sazkar e, hem netewe di wê da xuya dibe û hem jî parçayeke demajoya sazkirina neteweyê ye. Kanona edebîyatê, bi vebêjeyan pêwendîya hevpar hînê endemên civat/cemaetê dike. Edebîyat rojnivîska neteweyekê ye ku ew çîroka rabirdû, îro û ya siberoja neteweyê vedibêje. Çanda edebîyatê, hevgirîyeke xurt di nav endemên civatê pêk tîne û ji bo civatên derengmayî yên ku dixwazin nîşan bidin ku ji bo modernbûnê amade ne ra girîngîyek dihewîne (1998: 76).

2. Evîn

Evîn temayeke sereke ya berhemên hunerê ye ku hunermend bi vê temayê berhemên xwe watedar kirine. Gelek zanist li ser evînê rawestîyan e. Evîn, hesteke bingehîn ya merivî ye. Ew, bengînîyeke xurt û ji dilî ye. Girêdanî, dilsozî û sedeqatê dihewîne. “Evîn çalakîyek e, ne hesteke tebat e. Di nav tiştekî da bûyîn e, ne xwe pê va berdan e. Evîn kartêker e, ne hildan û wergirtin e, berîya her tiştî, evîn dayîn e (Fromm, 1985: 30).” Evin, ji serdeman bandor nagire, destê heyam û rojê nagihîje hêlîna wê ya bilind (Şeriati, 1992:106).” Evîn, hêzeke karîger ya hundirîn e ku dîwarên di navbera kesan da hene hildiweşîne, kesan digihîne hev. Evîn, hestên xwecihêgir û cudaker têkdibe. Bi evînê, kes xwebûna xwe diparêze û timîya xwe winda nake (Fromm, 1985: 29).” Bi vî awayî evîn hesteke xurt ya ku jîyanê erênî dike, hevgîhaner e, çêker e û nirxeke girîng ya merivayetîyê ye.

3. Trajîk

Trajîk, ji Yewnana kevn vir va ji alîyê feylesofan va hatiye ravekirin ku yekem car Aristoteles li ser wê rawestiyaye. “Aristoteles (bz. 384-322) li ser tragedyayê hurbûye û di pirtûka *Poetika*yê da ya ku trajîk e, vegotiye. Aristoteles, di *Poetîka*yê da tragedyayê wek cureyeke helbestê rave kiriye û nirxeke zêde daye wê. Ew, di berhema xwe da li ser zarîkirin (mimesis) û paqijbûnê rawestîyaye û bi awayeke hurgulî wan vekolaye (Aristoteles, 2017: bnr.).” Kirûya trajîkê, di qada hunerê da pêşîyê di tragedyayên Yewnana kevn da tê nîşandan. “Trajîk wek têgihek ji berberîya puxteya trajedîyê derketiye. Yanê ew bi trajedîyê va bi têkil e û îro zêdetir bi îronîyê va rewşeke aferîşa meriv rave dike (Balcı, 2016: 13).” Di trajîkê da du tişt nikarin li cem hev hebin. “Trajîk wek têgiheke serbixwe tê ramyarkirin. Taybetîya sereke ya trajîkê dijitî ye, dijitîya ku di heman tiştî yan jî rewşê da heye. Ev berberî, rageşîya hundir pêk tîne (Ji Bodkin neql: Balcı, 2016: 13).” Têgiha trajîkê di nav gelên cîhanê da “di jîyana rojane da bi wateyên êşdar, dilsoj, şîndar, herwiha ji bo rewş û bûyerên bi êş û keser tê bikaranîn, lê wateya trajîkê ji wateya wê ya di jîyana rojane da tê bikaranîn cudatir e. Herwiha wek şaşîyek, tragedya/trajedî, trajîk û dram wek bêjeyên hevwate tê bikarîn ku ev bêje ji alîyê wateyê va ji hev cuda ne (Çığrı Yıldırım, 2018: 1).” Trajîk êşa meriv

nîşan dide, lê "trajîk êş û kesera ku ji alîyê kesekî/kesan tê jîyîn îfade bike jî, ew ji êşa ku ji alîyê kesekî/kesan va tê jîyîn gelek cudatir e. "Trajîk, di bingehê da di qada felsefe, estetîk û edebîyatê da şert û mercên taybet îfade dike (Çığrı Yıldırım, 2018: VI)." Bi vî awayî tragedya/trajedî û trajîk ji hev cuda ne. Ya ku trajîk e ji jîyana rojane hatiye wergirtin û di qada hunerê da ji nû va hatiye honandin û bi vê jî cureyeke bi navê tragedyayê hatiye bidestxistin.

Poole, derbareyê têkilîya trajîkê bi jîyana rojane û berhemên hunerê va heye da dibêje: "Di bûyerên rastî da tarajedî tê dîtin û ji wan trajedî tê derxistin ku ev ne tişteke nû ye. 'Jîyana rast' nikare li ser navê xwe biaxive. Divê bi bêjeyan va werin dirûvandin, bi çîrok û rêzebûyeran va werin veguherandin. Lewra ya ku Aristoteles dianî ziman, ya ku ji helbestvan tê xwesitin ne helbestnivîsîn e, sazkirina rêzebûyeran e. Ya ku ji trajedîyê tê xwestin jî 'sazkirina rêzebûyerên baş' in (2013: 26-28)." Kes, bûyer û rewşên trajîk yên dîrokî bala nivîskaran dikişînin ku nivîskar ji wan deqeke trajîk, ango rêzebûyer, karakter û rewşeke trajîk bihonin. Poole dibêje, "kesayetên dîrokî, yên ku ber bi rewşên trajîk va xijikîne û têk çûne, herwiha netewe û welatên ku dûçarên bûyerên trajîk bûne û ew ên ku di dîrokê da hatine tomarkirin, bala nivîskaran kişandine û nivîskar deqa xwe ya trajîk li ser van agahîyên dîrokî sazkirine. Ev jî dîmana ku trajedî û dîrok bi hev va kelijîne, daye nişandan (2013: 29-32)."

Berhemên tragedyayê ya ku trajîkê pêşkeş dike, ji alîyê têgihîştina cîhanê li ser derûnî û ramanên bîner/xwîneran karîger e ku di vê mijarê da ramanên Aristoteles û Nietzsche ji hev cihê ne. Aristoteles dibêje; "armanca tragedyayê paqijbûn, xweru bûn, valabûn û xwe rehetkirin e ku ew jî bi dilşewatî û tirsê peyda dibin. Bi dilşewatî û tirsa ku di derûnîyê da diqewimin, gîyanê ji bengînîyan paqij dikin. Temaşakerê tragedyayê dema ku lîstikê temaşa dike, ji alîyê derûnî û hişî va paqij dibe ku ev jî bi bêjeya "catharsis"ê tê îfadekirin (2017: 29)." "Di vir da derdikeve holê ku Aristoteles di ya trajîkê da alîyekî rewiştî dibîne (Ji Abrams Neql: Balcı, 2016: 16)." Tê dîtin ku Aristoteles di kesayeta lehengê trajîk da xirabîyê nabîne. Di navbera me û lehengê trajîk yê bextreş da manendîyek saz dibe û em xwe di dewsa wî da xeyal dikin, yan jî hîs dikin. Ew, bi awayekî rewiştî, bandor li me dike, di me da dilşewatî û tirsê der dike û di encamê da xwepaqijî û xwerehetkirinek pêk tê. Lê Nietzsche, ramana Aristoteles ya 'catharsis'ê û ya ku tragedya paqijîyê pêk tîne napejirîne. Derbareyê vê da Dienstag dibêje:

> Ramana ku ji Aristoteles pêva hatiye pejirandin, ya ku tragedya, ji hestên ku rastîya ecêb ya rewşa merivayî diafirîne, paqijîyê pêk tîne, nedipejirand. Herwiha wî, derbareyê ku tragedya, ji alîyê tevgera rewiştî va waneyeke rewiştî ya hînker dihewîne jî nedipejirand. Nietzsche, tragedyayê wek dewama nêrîna ku gerdûn her gav di nav tevgerekî da ye, ew her tim di nav demajoya bûyîn û xerabûnê da ne, didît. Bi vî awayî ew nirx dide nêrîna feylosofên berîya Sokrates, yên Îyonyayê. Bi wî, hilşandina demê bi tragedyayê nayê rastkirin, yan jî telafîkirin, bes ew tê fehmkirin. Tragedya di pûxta xwe da pesimîst e. Hebûn tiştekî ecêb e, meriv jî xêvik e. Nêrîna trajîk ji bingeha agahîyên pesîmîst tên derxistin. Ya trajîk ji bo êşa hebûnê nabe derman, tenê hêz û kûrayîya vê êşê bi her kesî va dide nasîn. Ew, di tragedyayê da Dionysos derdixe pêş û tragedyayê bi wê rave dike. Ew dibêje, tragedya saf û demokratîk e, lewra ew ji nav gel derdikeve (2008: 138).
>
> Nirx, ji bo pêkhatina rewşa trajk xwedîyê cihekî grîng in. Rewşa trajîk di qada nirxan da û di navbera têkilîya nirxan da pêk tê. Trajîk bi xwe nirx nîne, qewimînek e û di encama berberîya nirxan da derdibe.

> Ya trajîk bixwe jî nirxeke baş, xerab, bedew û kirêt nîne. Ew, di tişt û merivdan da, tenê bi xêra nirxên ku di wan da heye, derdikeve der. Di cîhana ku nirxên aram hene da rewşa trajîk tune. Her kes nikare bibe kesekî/e trajîk û dûçarê rewşa trajîk be. Hin kes ji ber afirîşa karakterê xwe dikeve di nav rewşeke trajîk. Ji bo ya trajîk pêk were divê nirxek were tunekirin. Ya ku ji holê radibe hewce nake ku ew jîyana meriv be, dibe ku ew planek, daxwazîyek, hêzek, malek û bawerîyek be. Ya ku trajîk e, di encama berberîya du nirxên erênî da pêk tê. Lê divê ew tişt di xwe da nirxekî bala bihewîne. Nirxa ku tune dibe divê bi ya din va yan yeksan be, yan jî balatir be. Ango, ya trajîk ew e ku tişteke ku di xwe da nirxeke yeksan yan jî kêmtir dihewîne, alîyê ku bandor li vê tunekirinê dike ye. Wekû ku merivekî baş merivekî xerab têk bibe û bibe sebep ku ew hilweşe, ev rewş ne trajîk e. Lewra ev rewş ji alîyê rewiştê va tê pejirandin. Nirxên yeksan û bala û yên erênî, dema ku dûçarê hevûdû lewazkirinê û tunekirinê bibin, wê gavê trajîka herî xwerû û tekûz pêktê (Scheler, 2008: 240-241).

Tragedya û roman du cureyên ji hev cuda ne. Trajîk, di berhemên tragedyayê da hatiye nîşandan û di serdema nûjen da jî zêdetir di romanan da cih girtiye. Di serdema nûjen da bûyer, rewş û karakterên trajîk di romanan da derdikevin pêşberî xwîneran. Trajedî zêdetir di lîstik û şanoyê da xwe nîşan daye û di romanê da jî bûyer û nîgaş hene. Gelo di serdema nûjen da bi derçûna romanê trajedî lewaz bû yan bi hatina romanê ew kevn bû? Ya rast ev bû ku di serdema nûjen da roman geşe da û ji cureyên din yên edebîyatê derbaztir kir. Eagleton dibêje, "roman, ji cureyê bêtir dijcure ye, xwedîyê wê potansîyelê ye ku dikare cureyên wêjeyî yên din di xwe da bihelîne. Di romanê da helbest, dîrok, şîn, trajedî û gelek cureyên din yên edebîyatê dikare were dîtin. Bi wî, tişta ku roman nikaribe biqedîne heme hema tu bêje tune (2009: Bodur: 42)." Eagleton, roman û tragedyayê berawird dike û dibêje, "di devernîgarîya romanê da zinarên asê, çivangên dijwar, dîwarên ku meriv naxwaze bi wan ra rû bi rû bimîne, gelek kêm in. Di vê peywendîyê da roman pirsgrêkeke hêdî bi hêdî çûyîna dîrokê ye, lê trajedî mişt bi qeyranê va barkirî, pirsgrêkeke demê ye, ya ku bi rastîyekê ra avis e (2012: 243)." Hal ev e ku di serdema nûjen da roman di hewandina trajîkê da serkevt dibe û heta wek cureyeke romanê behsa romana trajîk jî tê kirin. "Henri Peyre û hin rexnegirên din, li ser vê angaştên ne ku 'roman, esasên hestgermîyên trajîkê erzan kir, rehn kir û hilda bin destê xwe (Eagleton, 2012: 239)." Di serdema modern da geşedanên sîyasî û civakî yên Ewropayê bandor li qada hunerê jî dikin.

> Li Ewropayê serkevtina çîna navîn ya li dijî esîlzadeyan, li hemberê trajedîyê serkevtina romanê pêk tîne û di romanan da honakên trajîk pêk tên. Romana trajîk wek cureyeke girîng di dawîya sedsala nozdehan da li Îngîltereyê bi daketina serdemî ya çîna navîn, derdikeve holê. Dilpakîyên çîna navîn li hemberî alozî û esîlzadeyan serkevt dibe, bi awayeke din roman, di dawîyê da li hemberî trajedîyê serkevt dibe. Herwiha di romanên welatên ewropoyê da honakên trajîk cih digirin. Nivîskarên Fransayê bi şoreşa bûrjûvayê rûtirş dibin ku Stendhal, Balzac, Flaubert berhemên tarajedîyê yên girîng dinivîsin. Wek mînak romana *Madame Bovary*, derbareyê hilweşîna trajîk ya jineke ciwan ku hatiye xapandin e. Di Kralîyeta Yekbûyî da Herman Melville, mînakeke honaka trajîk ya bêhempa ya ku bi karesateke xweser va bi encam dibe, dide (240-242).

Karakterê trajîk ji alîyê taybetî û heyînîya xwe va, di dîrokê da bi domara demê û bi guherînên dînî, civakî, derûnî û sirûştîyê va guherînan dixwe. Lê dem, şert û merc ji mêj va, bê rawestan, kesên trajîk hilberandine. Karakterê trajîk ji Aristoteles vir va ji alîyê lêkolîneran va hatiye

nirxandin. Aristoteles, di *Poetika*yê da çalakîyê girîng digire, ne karakter. Ew dibêje, "tragedya zarîya merivan nake, zarîya çalakî, jîyan, bextewarî yan jî serûbinbûnê dike. Meriv, li gorî afirîna xwe çawa bin dê wisa bin; lê bi çalakîyên xwe digihîjin bextewarîyê yan jî berevajîyê wê. Di tragedyayekê da çalakî û çîrok armancên sereke ne ku armanc ji her tiştî girîngtir e (2017: 31-40)." Eagleton, tîne ziman, ku "Aristoteles, behsa karakterên trajîk dike, lê çalakîya trajîk li ser wan hûr nabe, ya ku çalakîyê hevgirtî dike ne kirde ye. Karakter, rengê rewiştî ya çalakîyê pêk tîne. Karakter, ji çavkanîya çalakîyê zêdetir, hilgir û piştîgirê wê ye. Yanê çalakîya bêyî wan, mîna wênexêzê ku wêneyê bê boyax çêdike ye (2012: 116)." Çalakîya trajîk ya ku ji alîyê kesê/a trajîk pêk tê, bi karakterê wî/wê va pêwend e. "Meriv çi bike jî, di kîjan perwerdeyê ra derbaz be jî, yê li pey heman tiştî bikeve, heman tiştî bixwaze, mamosteyê wî/wê Seneca be jî, ew ê Romayê bişewitîne (Kuçuradi, 2019: 41-43)." Karakterek, li ser hilbijartina xwe ber bi alîyekî va çalakîya xwe pêk tîne û bi vî awayî dibe karakterekî trajîk. "Her çalakîyek, hilbijartinek dihewîne ku ev jî sekna rewiştî ya meriv bi dirûv dike, bi hilbijartina xwe ew bi karakterekî kifş va veduguhere (Yiğit, 2008: 159-160)." Her kesek xwedîyê avanîyeke karakterê xwe ye. Em li kirin û tevgerên meriv dinêhêrîn û karakterê wî/wê nasdikin, ku ev karakterê meriv hilbijartinên meriv jî dîyar dike. Di çalakîya meriv da karakter û hilbijartin xwe nîşan didin. Leheng, bi hilbijartina xwe û di encama çalakîya xwe da dibe lehengê trajîk. "Pêkanîna çalakîya trajîk û êşkişandin, di aferîşa karakterê trajîk da heye (Scheler: 2008: 240)." Her meriv xwedî nirx in, lê hin meriv hene ku him nirxên wan balatir in û him jî ji merivên din zêdetir bi nirxên xwe va girêdayî ne. Heke nirx bala be û girêdayîbûneke zexm jî li holê be, ev rewş dibe ku meriv bike lehengê trajîk. Li hemberê heman bûyerê yan jî helwestê, her kes di heman astê da nakeve di bin tesîra wê da, lewra hîskirin di merivên navînî da kêm, merivê trajîk da jî kûr e. Steiner dibêje, "Merivê trajîk, ji merivên navînîyê hêjatir, balatir û nêzîktirê rehê tarîya jîyanê ye (2011: 10)." Lehengê trajîk ne kesekî ji rêzê ye, ew ji kesên ku xwedîyê kesayet û jîyaneke asayî ne cuda ye. "Lehengê/a trajîk di navbera Xwedayî û zêdetir ya merivî da ye. Dema bi me ra were berawirdkirin ew derasayî ye. Lehengê trajîk di dîmena merivayetîyê da lûtkeyên wisa bilind in ku ew dişibin darên bilind yên ku îhtîmala brûsklêxistinê zêdetir di xwe da dihewînin (Frye, 2008: 114)."

Hilbijartin û çalakîya kesê trajîk berdêlek dihewîne. Kesê trajîk dema ku di navberê da dimîne hilbijartineke mecbûrî dike. "Lehengê ku teşe dide dîmena trajîk, divê bibe xwedîyê azadîya hilbijartinê yan jî wisa tevbigere ku dibê qey ew xwedîyê wê ye. Ev, di gerdûna zanistî da, ji bo ku li ser pêyan bimîne, teşeyeke azadîyê ye, ku peyda kiriye (Glicksberg, 2004: 102)." Di encama çalakîya lehengê trajîk da bedeldayîn heye. "Leheng bi pêş va çûyîna xwe, bi tevgerên xwe yên ku naşibe tevgerên merivên din, bi karê ku dikeve nav (ku ev kar li ser hêza gelek kesî ye), hybrisa[1] ku li hemberî sirûştê pêk tîne, divê berdêla wê bide, ji ber ku nirxeke bilind tune dibe, divê ew were dayîn, kesê/a ku dikeve di nav vî karî, bivê nevê dikeve di nav rewşeke trajîk da (Kuçuradi, 2009: 40)." Li ser van agahîyan, dikare were gotin ku di nav koma kesên trajîk da, zêdetir ramangêr, rewşenbîr û rêvebir derdikevin pêş ku ev kesan bi têgihîştin û zanînên xwe, ji dema xwe wêdatir nirx û nêrîn bidest dixin ku ev rewş jî wan ber bi rewşeke trajîkê va dixijikîne.

Karakterên trajîk yên serdema kevnare û yên serdema nûjen ji hev cuda ne. Şêweya bûyer û rewşên trajîk, nirxên berberîyê yên ku karakteran ber bi wêranbûnekê va dibin jî di navbera herdu serdeman ji hev cuda ne. Xwedayên serdema kevnare yên ku desten wan rasterast di nav jîyana karakteran da bûn û heyînên derasayî di deqên trajîk yên serdema nûjen da tune. Lê dîsa jî ya ku trajîk e her berdewam e.

1 hybris: bêpîvanîya ku merivan ber bi sûckirinekî va dehfdide, çavsorî û jixwebawerîya zêde ye (https://www.uludagsozluk.com/k/hybris/).

> Kapîtalîzm, sînorên navbera merivên cîhanê ji holê radike, cîhaneke hevpar ya ku çarenivîsîya herkesî li holê û bi guherînê ra vekirî ye, saz dike. Çarenivîsîya her kesî di heman nirxî da ne. Li cîhanê qeyraneke derketî, hilweşîna heyîna herkesî tehdît dike. Trajedîya ku qada dêwên rûhanî û xwedayan bû, niha hate demokratîkirin. Ji bo heyranên dêw û xwedayan ji holê rabû ku teza mirina trajedîyê ji vir derdikeve. Lê di şert û mercên demokrasîyê da her yekî me bi pîvanekî ku nayê berawirdkirin bi nirx in, ku trajedî êdî ji muxeyîle û sêwirandina serdema antîk wêdatir pirejimar bû. Di şert û mercên demokrasîyê da lehengên çîrokên trajîk, ji bo bibin trajîk mecbûr nînin ku bibin leheng. Ji bo bûyîna lehengê trajîk merivbûn têrê dike. Ji bo ku were têgihîştin ku trajedî derketîyê holê, divê were zanîn ku mêr yan jî jinek hatiye rûxandinê. Di cîhaneke wiha da tu kes ji trajedîyê ne dûr e (Eagleton, 2012: 136-137).

Bi vî awayî, ya trajîk, di serdema Yewnana Kevn û heta roja me wek rastîya merivayetîyê, di jîyana rojane û di berhemên hunerê da tê dîtin. Şert û merc buguherin jî, nirxên merivayetî û karakterên trajîk guherînan derbaz bikin jî ya ku trajîk e didome. Rewşa trajîk pêşîye bi berberîya nirxan dest pê dike. Vê berberîyê hilbijartin dişopîne. Lewra ev berberî, wek hilbijartineke nirxekî xwe dispêre kesî/ê. Kes, dûçarê berberîya van her du nirxên erênî dimîne û divê ji wan nirxên ku ji bo wî/wê hêja ne, yekî hilbijêre ku ev helwest jî xwe wek berberîyeke hundirîn va vediguherîne. Di vê berberîyê da hilbijartinek heye û ev hilbijartin mecbûrî ye. Divê nirxek were hilbijartin, ku di encama vê da jî nirxa din ya ku ji bo meriv hêja ye, yê were tunekirin. Merivê xwedî nirxê bala, li hemberê vê rewşa dijwar neçar e. Tam jî di vir da dîmena merivê cîhanê derdikeve li pêş çavan. Ev dîmena kêmasî û neçarîbûna merivê cîhanê radixe li ber çavan. Çalakîya ku nirxekî tune dike, bi xwe ra rewşa trajîkê derdixe der. Rewşa trajîk, ya ku bi hilbijartin û çalakîyê da derpêş dibe, bi dawîyên cihêreng bi encam dibe. Di encama rewşa trajîk da kesê/a trajîk şkestin dixwe, serûbinê hev dibe, ditemire û dikeve di nav tenêtî û bêhêvîyê, carinan dimire û carinan jî xwe dikûje.

Berberîya Evîn û Nasnameyê û Rewşa Trajîk di Romana Sîya Evînê da

Romana *Sîya Evînê* bi mirina Memduh Selîm Begê destpêdike, paşê vedigere jîyana wî. Ew, ji bajarê Wanê ye, ronakbîrekî Kurd e û li Stenbolê dijî. Di serdema wî da hem di cîhanê da hem jî di welatê wî da guherînên sîyasî û civakî yên dijwar û giran pêktên. Welatê Osmanî hildiweşe, dewsa wê komar û rejîmeke nû tê avakirin. Ev geşedana nû kesên demokrat û lîberal ji welat dûr dixîne, herwiha ji bo etnîkên din yê welat, nirxên azadî û wekhevîyê tên tunekirin. Ji bo Kurdên azadî û wekhevîxwaz, herwiha yên ronakbîr jî rêya welatê xeribîyê ango ya sirgûnê kifş dibe. "Şeytanên sererd û binerd di kincên serdest û karmendên nû yên Tirkiyê de hatine xezebê. Ew ketine pey kes û hêzên ku li dijî tevgera wan bûn. Li her aliyê welêt sêdar hatine daçikandin. Meriv tên girtin û kuştin. Yên mayî direvin (Uzun, 2005: 32)." Memduh Selîm Beg, bi hêvîya vegereke nêzîk, xatirê xwe ji bav, xwîşk û pirtûkên xwe dixwaze û li ser pêlên deryayê xwe berdide ber bi xerîbîyê. Ew, li ser Îskenderîyeyê derbazê Antakyayê, ya ku di bin destê Fransizan da bû, dibe. Ew, li alîyê vê sînorê welat e, hêvîya wî ev e ku, dewr û dewran yê biguhere, bextê çê yê lê bizivire, destê dilbera xwe bigire û vegere welatê xwe, li nik Deryaya Wanê xanîyek ava bike. Bedena wî li xeribîyê ye, lê hişê wî her tim li welat e. Derd, kul, kerb û xezebên xerîbîyê dilê wî diêşînin. "Rojek li Antakyayê li çayxaneyekê rûnîştiye û li wir dibîne ku çivîkek ji hêlîna xwe ya ser dara asê dikeve. Gelek pê dikeve û di dawîyê da çivîkê digihîne hêlînê û wiha dibêje, …her kes di hêlîna xwe da kêfxweş û dilşa ye, çivîk jî di hêlîna xwe de (43)." Tê dîtin ku Memduh Selîm Beg di navbera rewşa xwe û ya çivikê da mînanîyek hîsdike. Lewra ew jî 'ji hêlîna xwe ketiye xwarê'. Ji hêlînê ketin, li ser derûnîya Memduh Selîm Beg, bandoreke neyînî pêk anîye. Hêlîn ango welat,

mal, aîdîyeta axê ji bo nasnameya kesekî ango neteweyekê hêman û nirxên girîng in.

Keçika bedew Ferîha û Memduh Selîm Begê çeleng, ji ber heman hincetê li Antakyayê ne. Ferîha jî wek malbatî sirgûn bûne û hatine Antakyayê. Siûd, Memduh Selîm Beg û Ferîhayê li sirgûnê rastê hev anîye û ew li wir dilberdane hev. Sîya vê evîndarîyê, li sirgûnê ji bo Memduh Selîm Beg bûye wek stargehek. Dilbera Memduh Selîm Beg Ferîha, Çerkez e û keçikeke gelek bedew e. Ferîha, xwedîyê rihekî hunerê ye û musîkhez e. Ew jî mîna Memduh Selîm ji muzîkê hez dike û kemançayê dijene. Di heman demê da girêdayê çanda xwe ya etnîkî ye û bi rew û rûsûmê çerkezîyê tevdigere. Herwiha Memduh Selîm Beg, ji edebîyatê, bi taybet ji helbestan hezdike. Bi wî; "dilê ku derîyê xwe ji şiîr û germîya şiîran ra veneke, dilekî nîvmirî ye (48)." Ew, evîna dilê xwe bi helbestan dîne ziman ku serî li helbestên Melayê Cizîrî dixe: "Şox û şengê zuhrerengê dil ji min bir dil ji min...(48)" Memduh Selîm Beg û Ferîha xwedîyê hezên hevpar in. Ew ji hunerê hezdikin. Bi taybet mûzîk wan nêzîktirinê hev dike. Memduh Selîm Beg, navê Ferîhayê danîye Xezal. Xezal, di nav Kurdan da bedewîyê temsîl dike. Memduh Selîm Beg, dewa Ferîhayê dike û roja sersalê qewl tê birîn, destê Ferîhayê bo Memduh Selîm Beg tê girtin. Ew, bi vî awayî li xerîbîyê ji xwe ra starîyek peyda dike û xwe dide taldeya wê. Hevalekî wî yê dilsoz jê dipirse dibêje, behs dikin dibêjin destgirtîya te pir xweşik e û Memduh Selîm jî derbareyê dilbera xwe bersivek wiha dide:

> Homeros ji bo vê meselê mîsala herî baş e. Di derekî de, ew ji bo sê jinan weha dibêje; Nireus xweşik bû, Akhileus hîn xweşiktir bû, Helena xwedanxweşikiyeke nedîtî bû... Mîrê min, hûn dibînin... kin û kurt; xweşik, xweşiktir û xweşikiyeke nedîtî. Destgirtiya min jî carina xweşik e, carina ji her carî xweşiktir e û carina jî xwedanê xweşikiyeke nedîtî ye (54).

Bi dost û hevalan tev, nîşana Memduh Selîm tê pîrozkirin. Piştî nîşanê divê dawet were kirin. Keçikeke mîna Xezalê gelek xwezginîyê wê çêdibin. Dawet divê. Demek ji vê hewaya germ û bi hestên evîn û evîndarîyê dagirtî, pirsgirêkên neteweyî, Memduh Selîm Beg, ber bi xwe va dikişînin. Memduh Selîm diçe Beyrûtê li cem hevalê xwe yê Celadet Bedirxan. Ew, li wir biryara xebateke nû digirin. "Birayo, em dê dest bi xebatê bikin. Xebateke xurt, nûjen û bi rêk û pêk. Her tişt divê nû be, her tişt divê modern be (62)." Xebat ji bo nirxên bilind û derûnîyeke xweş. Hinceta xwebatê wiha tê ziman: Sebebên xebatê; bûyerên welêt, siyaseta dewleta Tirkiyê, perçebûna welêt, serîhildana 1925 an, şikestin, qetlîam, bêdengî, mij û dûmana ku ji welêt radibe, malên hilweşiyayî, jinên bêkes û xemgir, zarokên tahzî û stûxwar… (63)." Pêlên serdema bîstan derbeke giran li Kurdan dixe. Kurdên neyekbûyî ketine di nav geremolekê û dikin ku çareyek bibînin, lê bidestxistina vê çareye ji bo wan gelek dijwar dixuyê. "Yanê destana dîlketinê. Trajediya welatekî jihevketî (63)." Ev rewşa xerab, rewşa gel û dem ji ronakbîran çare dixwaze. "Ew dizanin ku berpirsiyariya qedera milletekî binpê ketiye ser milê wan. Pir kes ji hevalên wan hatin kuştin. Ew jî di bin siya şûrê Ruhistîn re bihurîn (2005: 71)." Rewşenbîrên sirgûn yên Kurd li Beyrûdê partîyek ava dikin û navê wê dadînîn Xoybûn. Ev partî wek hebûna gel, welat û jîna Kurdan dîyar dikin. Tê dîtin ku nirxên berz li partîyê tê barkirin. Bi vî awayî ew ê nîşanê cîhanê bidin ku Kurd namirin. Bi vê pêngavê Memduh Selîm Beg, gelek kêfxweş dibe. Demajo Memduh Selîm Beg, ber bi dubendîyê va dixijikîne. Ew, dikeve di nav berberîyeke hundirîn. "Dengên dil û mêjî; berberiyeke stûr, berberiyeke malkambax. Kîjan deng? Ew bêtir li kîjan dengî guhdarî bike? Deng tên ber hev. Ew tên wezinandin (81)." Ew, dikeve di nav mij û dumanekê. Mêjî û dilê wî li hev nakin û ji hev vediqetin. Ev berberîya dil û mêjî, wî li hev dibe û dîne. Mayîn û neman li pêşîya wî sekinîne. Di vir da ya ku trajîk e xwe dide hisîn, lewra trajîk di berberîyê da veşartiye.

Kuçuradi dibêje, "Scheler û Nietzsche, alîyên cuda yên trajîkê dîtine. Scheler, ramana 'trajîk di hin rewşên kifş da di berberîya du nirxên berz (û erênî) da derdibe', danîye holê. Nietzsche, ramana 'kesê/a ku di rewşa trajîk da ye, ji bo nirxekê ra hem erê hem jî na dibêje' parastiye (2009: 48)." Kuçuradi, van her du ramanan dipejirîne, lê kêm dibîne û lê zêde dike:

> "Dema ku bûyer pêk tên, rewşên wisa dertên ku du nirxên berz nikarin li cem hev hebin; pêkhatina yekî tunebûna ya din hewce dike. Di rewşeke wiha da ew kes disekine; ji bo her du nirxan, ji bo xwe 'erê' dibêje, lê ji bo ku ya din tune dike, di heman demê da 'na' dibêje û didomîne. Trajîk li vir, di vê rewşê da derdikeve der (2009: 48)."

Di derûnîya Memduh Selîm Begê da dil û hiş dikevin di nav berberîyekê. Ev berberî wî ber bi kesekî trajîk va dixijikîne. Lewra nasname jî evîn jî ji bo wî nirxdar in. Ew, ji herduyan ra jî erê dibêje. Ji alîyekî va dil û Xezal hene, ji alîyê din va netewe û nasname hene. Karakterê trajîk vê rewşê di nav mijekî da dibîne. Ya ku trajîk e di vê dema sekna karakterê trajîk da dikemile. Divê tiştek bike ku xwe ji vê dubendîyê xelas bike.

Memduh Selîm, bi xezûrê xwe ra diaxive û dibêje wî, gelê Kurd dest bi xebatekê kirine, hêvîya min pir e. Veger nêzîk e, em ê vegerin welatê xwe. Xwesîya Memduh Selîm Beg, bi wî ra diaxive. Gelek kes çavberdidin Ferîhayê û tên xwezginîyê wê. Ev rewş malbata Ferîhayê aciz dike. Memduh Selîm divê di demeke zû da dawetê bike. Xwesî, behsa edetên xwe dike û daweteke zû daxwaz dike. Memduh Selîm jî dawetê dixwaze, lewra xezala dilê wî, yê bibe stûna mala wî û ronahîyê bireşîne li ser jîyana wî, bibe yar û hogira wî. Di heman demê da Rêvebirîya Fransayê ya li Antakyayê, ji Memduh Selîm daxwaz dike ku karekî sîyasî neke û ji wir neqete. Li alîyê din, li Agirîyê Kurdan sarîhildane. Divê yek ji partîya Xoybûnê, ji bo kar û barên sîyasî here Agirîyê, here enîya şer. Germîya çirûskên şoreşê xwe digîhîne Memduh Selîm Beg. Vêcarê jî Agirî dibe navenda siûda Kurdan. Memduh Selîm Beg gelek bêhnteng dibe û diponije. Şerê Agirîyê, derîyê vegera welat, hebûn û nebûn, Memduh Selîm ber bi xwe va dikişîne. Ew difikire: "Li ser siûda xwe û siûda welatê xwe. Eger ew ne kurd bûya, siûda wî dê, dîsan, weha bûya? Siûda fransizekî, erebekî, tirkekî, îngilizekî çawan e? Ferq di navbera siûda kurdekî û siûda merivekî din de çi ne? Û tiştê herî girîng, ew dil dike ku bibe xwediyê siûda fransizekî? (Uzun, 2005: 127)." Vêcarê xezûrê Memduh Selîm behsa dawetê dike. Dibêje, bira dawetekî wisa be, dengê defa me bigihîje tixubê Tirkiyê. Daweta bi edetên Kurd û Çerkezan. Daweta du xelkên bindest. Di derûnîya Memduh Selîm da şereke dijwar diqewime. Agirî û zewac, dewat û şer, dengê defê û dengê gulê."Dîsan du deng; dengê dil û dengê mêjî. Dîsan şer. Şerekî bêhempa. Çi divê? Çawan? Kîjan rê?(135)."

Meriv, xwe bi rastînîyên ji hev cuda va girê dide û ev rastinîyan bê wate, bê nirx û armanceke şaş bihewîne jî, meriv bi dilsozî xwe bi wê va girêda be, ji bo wê diçe mirinê jî. Ji bo meriv, xwe bi wê îdealê va girêdan, bi wê rastîyê va biyekbûn û li ser wê rastîyê mayîn, taybetîya heyînîya meriv e, ku ev ji bo meriv trajedîyek dihewîne. "Ji bo Arthue Miller zagon na, rastî nirxdar e. Bi ramana Miller, ya ku teşe dide çalakîyan û wan beralî dike, zagonên civakî ne jî, lewra ew bi qasî çarenivîsîya klasîk, rastinîyeke stemkar e. Bandora zagonên civakî ya li ser kesan, ji hiqûqa qewmî ya ku bi rêvebiriya nav û Xwedayan pêk tê, kêmtir nîne. Herwiha hişdarîyeke tam ji bo kirdeyan (merivan) ne pêkan e, 'di karakterekî da sînorekî tûnd ya têgihiştînî' heye (Ji Miller neql: Eagleton, 2012: 141)." Bi vî awayî rewşa Memduh Selîm Beg ji karakterekî trajîk yê serdema kevn ne kêmtir e. Malxezurana wî dewateke demildest daxwaz dikin, ku gelek xwezginîyê Ferîhayê hene û gotegot jî derdikevin. Divê Memduh Selîm Beg bi lez vê dawetê bike.

Aristoteles, dema ku li ser karakterê trajîk radiweste dibêje, "…karakter tişta ku hilbijartinek nîşan dike ye (2017: 50)." Aristoteles, di tragedyayê da girîngî dide çalakîyê. Ew dibêje, "tragedya, bizarîkirina çalakîyeke zadegan (soylu) e, ya ku di demekê da pêk hatiye û bi dawî bûye. Tragedya, zarîya merivan nake, ya çalakîyê dike, targedya bê çalakî nabe (30-31). Kuçuradî dibêje, "…çalakîya ku leheng dike leheng, wî/wê tune jî dike; yan jî mîna trajedîyên nû, tişteke binirx, hezkirinek, projeyek û tişteke ku bêyî wê nikare bike, tune dike. Di nav yên ku çalakîyê dikin da, hin kes dizanin ku tiştekê wan yê tunebibe û hin kes jî nizanin, lê ev her du jî trajîk in (2009:41)." Memduh Selîm Beg halê xwe yê ku di nav berberîyeke dijwar da ne dîne ziman, piştra hilbijartina xwe dike. Ew ê here Agirîyê. "Berberiyeke malkambax; "ez diherim." Lê... "Lê"yeke pirstijî (Uzun, 2005: 135)." Memduh Selîm Beg, bi dilekî bi guman diçe. Tê dîtin ku lehengê romanê ber bi alîyekî va çalakîya xwe dike. Di vê alîyê çalakîyê da ew hilbijartinekê dike ku gelo ev hilbijartineke azad e, ji bo lehengê trajîk? Derbareyê vê Kuçuradî dibêje: "Di rewşa trajîk da kes azad in, lê kesê/a di rewşa trajîk da ye, yan jî kesê/a romanê ji ber hewcetîya ku çalakîyê ber bi alîyekî va pêk bîne, azadîya zarûrî ya trajîk dijî. Em bi her tiştî û bi hemû hêza xwe, li pêşîya felaketê bisekinin jî, ev hewcetî yê dîsa bi ya xwe bike. Di vir da tê dîtin ku çarenivîsa trajîk naguhere. Ji ber vê zarûrîyeta trajîk, cî nade ji hilbijartinên bi hişî û azad pêk tên ra (Orr, pêşgotina wergêr, 2005: 15)." Tê dîtin ku karakterê trajîk di hilbijartinê da xwedî azadîyekê be jî, ji ber mecbûrîyeta hilbijartinê û mecbûrîyeta ber bi alîyekî va çalakîya xwe pêkanînê va, azdîyeke zarûrî ya ku trajîk pêktîne. Lehengê romanê, ber bi nirxên nasnameyî va çalakîya xwe pêk tîne. Evîna hêz û hesteke herî xurt e, nirxeke berz e, li paş tê hiştin. Di berberîya du nirxên berz ya hiş û dil da, ango ya nasname û evînê da ya ku tê bijartin hiş e. Ji herdukan ra jî erê, lê ya ku pêş tê girtin nirxên netewetîyê û nasnameya neteweyî ne. Lê heke leheng çalakîya xwe ber bi dil va, ango ber bi evîn û zewacê va bikira, wê demê yê berpirsîyarîyên xwe yên dîrokî, neteweyî û rewşenbîrîyê pêk neanîya. Di trajîkê da leheng çalakîya xwe bi kîjan alî va bike jî ew ê ji alîyekî bimîne û dîsa ya ku trajîk e yê pêk were.

Ferîha û malbat, nizanin Memduh Selîm yê biçe li ku. Bes dizanin ku ew ê ji bo du mehan veqete, piştra yê were dawetê bike. Di hilbijartina wî da mirin jî heye mayîn jî. Serkevtin jî heye, binketin jî. Ew diçe enîya şer. Du meh derbaz dibe lê ew venagere. Meh li ser hev derbaz dibin û berxwedan têk diçe. Kurd bindikevin û Memduh Selîm jî têk diçe. Ew, ji Agirîyê vedigere, ji agirê şer ber bi agirê evînê va. Ew, tê Antakyayê, diçe mala xwe, lê dibîne ku di malê da malbateke Ermen şeş meh e bi cih bûne. Ji malbatê derbareyê kirivanê malê, ango derbareyê xwe agahî werdigire. Wan bihîstine ku berîya wan li vê malê merivekî hêja, dilsoz û pak hebûye. Lê ew di şerekî da hatiye kuştin. Memduh Selîm Beg, li mala xwe hîn dibe ku ew miriye. Ji wir vediqete, diçe mala xezûrê xwe, lê li wir Ferîha tune.

> Êvareke tahl, kirêt, zîz, ji agirê dûjehê xirabtir. Êvareke ewçend dilsoj ku bi peyvan nayê salixdan. Ma Memduh Selîm Beg ji vê êvarê xirabtir êvar jiyaye? Ew niha mirinê dil dike. Di dewsa vê êvarê de mirinê. Xwezî ew, bi rastî, li ser çiyayê Agiriyê bihata kuştin, bombeyeke balafirê, bi rastî, bihata û li ser serê wî biteqiya... Vê êvarê dinya wî hilweşiya. Miraz û daxwaza wî ya herî mezin, herî xweş, herî muqeddes şikest. Dinê li ber wî reş bû. Mala hevalê çerkez bû cehenem. Dilopên barana derve bûn pêtên êgir û ketin pêsîra wî... Ew çi bibêje, çi bike? Ji destên wî çi tê? Ferîha tune. Ferîha çûye. Ferîha zewiciye. Belê, rast e, wê mêr kiriye û çûye Urdinê. Hin demên kin û kurt hene ku dikarin jiyanekê, bi carekê, ser û bin bikin (2005: 175-176).

Memduh Selîm Beg, bi hilbijartinê û çalakîyê dibe karakterekî trajîk û bedela vê çalakîyê

dide. Kuçuradî, ji bo lehengê di vî rewşê da ne ra dibêje, "Leheng, bi vê çalakîya xwe (ku ev kar li ser hêza gelek kesî ye), *hybris*a[2] ku li hemberî sirûştê pêk tîne, divê berdêla wê bide, ji ber ku nirxeke bilind tune dibe, divê ew were dayîn, kesê/a ku dikeve di nav vî karî, bivê nevê dikeve di nav rewşeke trajîk da (2009: 40)." Uzun, di romanê da evîneke gelek xweşik ava dike ku ev jî têkçûna evînê êşdar dike. "Lehengê trajîk li dijî çarenivîsîyê şer nake, Di rastîyê da ew êşa ku dikşîne jî heq nake. Ew korkorane dikeve di nav kavilka xwe. Ew, bi barê giran yê wêran, lê yê tovrind û hêja, yê li ser pişta wî, bi sekna xwe ya di nav vê cîhana xofdar da, wek kelemekî ku ji dilê me xwîn diherikîne ye (Ji Nietzsche neql: Dienstag, 2008: 138)." Evîneke delal û xweşik têk diçe. Ev evîna têkçûyî heta mirina wî dibe sîya Memduh Selîm Beg. Piştî vê derbek ji Fransizan tê. Berpirsîyarên Franzis, bi hinceta endamtîya Xoybûnê, mamostetîya wî ji destê wî digirin û vê carê jî wî sirgûnî Şamê dikin. Memduh Selîm Beg her tiştî winda dike. Ji ber çalakîya xwe ya ji bo netewetîyê, herwiha nirx û pirsgirêkên nasnameyê kiribû, ji karê xwe û ji bajarê ku lê cih bûye jî dibe. Ev rêya ku ji bo hêlîna xwe saz bike, bi her carî wî bêhêlîn dihêle. Ew, li hemberê vê tevgera Fransiz, ji ber bûyerên xerab ku li serê wî û neteweya wî da hatine, xwe wek kesekî mecbûr dide zanîn.

> Welatê me perçe bûye, her tiştê me hatiye qedexekirin, xelkê me di bin eziyet û zulmeke ecêb mezin de ye... Eger hûn, belê hûn di rewşeke weha de bûna, we dê çi bikira? … Em jî ew tiştên ku her kes mecbûr dimîne û dike, dikin, monsieur Collet. Ne zêde, ne kêm. Em dixwazin welatê xwe biparêzin. Em siyaset nakin, xwe diparêzin, dixwazin xwe biparêzin. Siyaset ne karê me ye...(Uzun, 2005: 181).

Ew, helwesta xwe, ji rêvebirekî Fransizî ra parvedike. Fransa, ew cihê ku tova nirxên neteweyî, nasnameya neteweyî, netewedewletîyê hate avêtin û bi vê tovê hemûyê cîhanê hejand ra.

> Rastî, rastiya kurdan. Rastiya merivê kurd. Rastiya jiyana Memduh Selîm Begê. Jiyaneke tevlihev, têkel, bi lez û bez, bêdaxwaz û miraz, tijî tehlûke, her gav nêzîkî mirin û kuştinê. Wekî gerekê, meşekê di newala mirin û kuştinê de. Û peyvên ku doralî li jiyana Memduh Selîm Begê girtine; mirin, kuştin, bidarvebûn, bidarvekirin, zîndan, girtîxane, zor, zordarî, bindestî, sirgûnî, hawar, şer, liberxwedan, fedakarî, xebat û h.w.d... Gava jiyanek bi van peyvan were rapêçandin, hingê çi dibe? Ev sereskerê fransizî ku li hember rûniştiye û fermanan direşîne, dikare jiyaneke weha fahm bike? (181).

Di vê rewşa trajîk da gelo şaşîyek heye? Dibe ku leheng şaşîyek kiribe? Di vê têkçûnê da kî sûcdar e, gelo em dikarin leheng sûcdar bikin? Ango, em dikarin bêjin di riyê Memduh Selîm Begê da evînek, du evîndar û jîyaneke xweşik têk çûn. Lewra di navenda çalakîyê da ew bixwe heye. "Aristoteles, di '*Poetika*'yê da, 'şaşî/kêmasî'yê bi têgiha 'hamartia'yê îfade dike. Şaşîya trajîk ya Aristotelesî, nîşan bi cihekî navberî ya gerdûna rewiştî dike, yanî têkilîya çalakîyên leheng ya bi têkçûna leheng şêlû dike. Têkçûna ku bi şaşîyê pêk tê, têkçûneke ne tê heqkirin ne jî nayê heqkirin e. Ev têkçûn tenê rê li ber çalakbûna dilşewatî û tirsê vedike. Herwiha şaşîya trajîk, wek şaşîya dînî ya li hemberê Xwedayan, sûcekî rewiştî, ji ber kêmasîya agahîyê pêk hatiye, rave kirine (Eksen, 2008: 148-150)." Di serdema Yewnana kevn da lehengê trajîk di kirinên xwe da xwedayan berpirsîyar didîtin, lê didan zanîn ku yê ku dikin ew bixwe ne, mîna Oidipus ku wî digot "yê ku vê çalakîyê kir Apollon bû, lê dest yên min bixwe bûn (Sofokles, 2009: 62)." Di sedsala bîstan da ji bo vê şaşîyê hewceya ravekirineke tevgir çêbûye. Di serdema modern da ev

2 hybris: bêpîvanîya ku merivan ber bi sûckirinekî dehfdide, çavsorî û jixwebawerîya zêde ye (https://www.uludagsozluk.com/k/hybris/).

rewş diguhere ku lehengê trajîk tucar xwe ji çalakîyên xwe naşo. Ji ber çalakîyên xwe bes Xwedê berpirsîyar nabîne. Gelo Memduh Selîm Beg di çalakîyên xwe da bi serê xwe ye, yan di bin dîyarbûnîyên hêzeke din da ye? Di bingeha çavkanîya çalakîyê da sê nêrîn derdikevin der ku çavkanîya yekem hêzên sermerivayî, çavkanîya duyem leheng bixwe û ya sêyem jî şêlûye û qada navberê ye. Ev, di encama ji têkilîyên hundurî û dervayî pêk tên ku ka kîjan hundirî û kîjan dervayî ye ji hev veqetandin dijwar dibe. Kirde, di navenda çalakîyê da tê dîtin lê di tragedyayê da rageşîyek di navbera dîyarbûnî û vîna azad da heye. Gelo kirde di kirin û çalakîyên xwe da bi serê xwe ye, yan di bin dîyarbûnîya hêzeke din da ye? Hilbajartin û çalakî bi vîna leheng pêk tê û berpirsîyarê wê leheng e, yan hêzeke din e? Bersiva van pirsan li gorî serdema merivayetîyê diguhere lê ya ku trajîk e û lehengê trajîk di her sedemê da wek xwe dimînin. “Heke kirde di bin dîyarbûnîya hêzeke din da be, arîşeyîya bingehîn ev e ku kirdeya ku di navenda çalakîyê da ye, di çi pîvanê da xwedîyê derfeta pêkanîna vîna xwe ye, bi awayeke din kartêkerên derva bi çi pîvanê dîyarbûnîyê li ser vîna azad pêk tînîn? Em bi ‘arîşeyîya vîn-dîyarbûnîyê’ nêzîkî trajedîyê bibin, hilweşîna trajîk wek tiştanokeke tevlihev hêvîya çareserbûnê dimîne. Heke em ji vir derkevin rê, em dikarin xwe bigihînin du encaman. Encema yekem, trajedî, merivên ku dûçarê dîyarbûnîyên derva dimînin û dikevin di nav şaşîyên ku ne di destên wan da nin û ji ber vê jî cezayê dikişinin, vedibêje. Lê ev dûrî têgînên roja me yên edalet û rewiştê ne ku ev encam pêşveçûna rewiştî ya meriv ya destpêkê temsîl dike (Ji Adkins neql: Eksen, 2008: 153).” Encama duyem jî beravaji ya yekem, “dikare were gotin, li hemberî her cureyên dîyarbûnîyên sermerivayî, meriv xwedîyê şaşîyên ku bixwe kirarên wan in. Bi vê nêrînê, dikare were gotin ku cîhana trajedîyê ya rewiştî, ne zêde ji rewişta cîhana îroyîn dur e. Bi vê nêrînê, şaşîya leheng ya trajîk, ji wê qada çalakîyên tevlihev ya ku xwedayên wê serdemê bi serbest di tê da digerîyan, hatiye xelaskirin, bi vî awayî bes şaşîyeke ku aîdê leheng e, yê were dîtin, yê were gotin ku kirarê hin çalakiyên kifş, yên leheng in, bi vî awayî jî hilweşîna trajîk yê bikaribe were ravekirin (Ji Nussbaum neql: Eksen, 2008: 153).” Tê dîtin ku şaşîya trajîk (hamartia) wek têgihek ji Aristoteles vir va li ser wê şîrove hatine kirin. Hamartia, bi rewiştê va pêwend e û divê ew şert û mercên rewiştî yê wê serdemê li ber çavan werin girtin û li ser şaşîya trajîk ya leheng were rawestan. Bi vê nêrînê dema ku em li ser çalakîya lehengê trajîk ya romanê radiwestin, em dibînin ku şert û mercên wê serdemê bûne çavkanîya rewşa trajîkê, herwiha trajîka ku di puxta cîhanê û hin kesan da veşartiye derxistine holê. Memduh Selîm Beg, wek rewşenbîrek xwedîyê nirxên rewiştî û kesayetekî kifş, yê ku di xwe da puxta trajîk dihewîne, dema ku dikeve di nav berberîyê da bi hilbijartin û çalakîyên xwe ber bi rewşa trajîk va dixijike. Lewra kesê/a trajîk di hengama berberîyê da û di çalakîyê da xwe kifş dike. Dema ku çûyîne qada şer, şerê agirî, ji bo wî tê pêşnîyarkirin di wê demê da di wî da berberîyeke xurt destpêdike û li ser vê difikire. “Agirî; navenda jiyanê, daxwazên dilsoz, best, siûd û mirin (Uzun, 2005: 127)” Dikare bêje na, ez naçim. Ango ez naqedînim herim, lewra zewaca min heye û heke ez herim dibe ku tiştek were serê min û ez bimirim. Evîna min û dilbera min yê çawa bin. Lê, ew biryar dide ku here qada şer. Şert û mercên ku leheng anî vê derê bi destê dîyarbûnîyên derva pêk hatin, lê vîna çalakîyê ya leheng bixwe ye. Leheng kiryar bixwe ye. Hêzên sermerivayî û yên merivayî vê hilbijartinê û çalakîyê bi darê zorê bi wî nedane kirin. Wî, bi vîn û rewişta xwe, vê biryarê da.

Çarenûs hêmaneke girîng ya trajîkê ye. Di gotinên vebijêr û hin gotinên Memduh Selîm Begê da behsa çarenûsê tê kirin. Di romanê da ew çarenûsa Kurdan ya ku bi her carî bi têkçûnê bi encam dibe tê vegotin. Dema ku ew digîhîje lûtkeya neçarîyê lawayî bi Xwedê dike: Di romanê da li ser negihîştina evîndaran, bi destana Mem û Zînê tê ziman. Memduh Selîm Beg, di dawîya jîyana xwe da bang li Xwedê dike:“Bi keser. Kelgirî. “Xwediyo!.. Çima tu weha dikî? Çima te ev neheqî qebûl e? Çima tu evîndaran, van stêrkên delal nagihînî nik hevûdu?..(211).” Ev pirsên

ku ji kezebeke şewitî derdikevin û ji Xwedê tê pirsîn, gotinên Oidipûs bi bîr dixin. “Kîjan xwedê wiha fît da te?” …“Apollon, dostên min, Apollon! Ev êşên ku ez nikarim ber wan tab bikim, ew dide min. Lê destên ku çavên min kor kirin ne destên yên din in, destên min bixwe ne” (Sofokles, 2009: 62).” Di mînaka Oidipus da destên xwedayên wê serdemê di nav kar da ne, yê ku vê êşê dide, ji nav xwedayên wê serdemê yê bi navê Apollon e, lê berpirsîyarê çalakîyê Oidipus bixwe ye. Di mînaka Memduh Selîm Beg da xwedî û berpirsîyarê çalakîyê Memduh Selîm Beg e, lê ew ji Xwedê dixwaze ku têkilî pê bike, destê xwe dirêjî di nav kar bike û vê çarenûsa xerab berevajî bike, evîndara bigihîne hev, ango pêşîya vê êşê bigire. Di her du deqan da jî têkilîya rewşa trajîk bi têgihîştina çarenûsa serdemên karakterên trajîk va hatiye dayîn.

> …lê qedereke wekhev. …Li pey wan mirin û sêdar, li pêş wan mij û dûman. Ba û bahoza babilîska 20 an. …Ba û bahoza xwedanmesûliyetiyê. … Merivên bargiran. Hevalên Memduh Selîm Begê hay li rewşê heye. Ew dizanin ku berpirsiyariya qedera milletekî binpê ketiye ser milê wan. Pir kes ji hevalên wan hatin kuştin. …Şûrê Ruhistîn li ser milê wan û milletê wan hilawistiye. …Ew şûrê Ruhistîn e ku tarîxeke nû, tarîxeke derewîn aniye pê û h ser wan ferz kiriye. … Rê divê lê were girtin. Ev gava me, ev gava ku em niha davêjin, divê tarîtiya ku dijmin li tarîxa me vegirtiye, biqelişîne û ronahî bireşîne ser tarîxê (2005: 70).

Ji van agahîyên romanê tê dîtin ku karakterên romanê ji karakterên serdema kevnare yê Yewnanê cudatir in û xwedî vîn in. Çarenûsek heye lê ev çarenûs ji ya serdema kevn ya Yewnan cudatir e. Karakterê romanê dikarin ji bo çalakîyên azad biryar bigirin û pêk bînin.

Evîn û evîndar têk çûn. Ferîha bi zewaceke ecêb rihê xwe kuşt. Sûcdar kî ye? Derbareyê vê tu kes nikare rasterast leheng sûcdar bike, lewra neyînîyên ku ji encama çalakîya leheng derketin, ji alîyê leheng va bi zanetî nehatine kirin. Lê dîsa jî em nikarin bêjin ew ne sûcdar e jî. Lewra çalakîya leheng têkçûn û êşekê derxisitye der. Derbareyê vê “Hegel dibêje, di heman demê da ev suc tişta ku lehengê trajîk mezin dike ye. …Lehengê trajîk hem sucdar e, hem bê suc e; hem gunehkar e, hem jî bê guneh e. Rewşa trajîk di van berberîyan da ye. Tunalı jî dibêje, sûc, hemûyê merivan dorpêç dike, ku ew di bingeha hebûna meriv da heye. Di tragedyayê da êşa ku meriv dikişîne, tenê êşa wî/wê ya takekes nîne, êşa sûcê hevpar ya hemû merivayetîyê ye (Balcı, 2016: 16).” Ev tespîtên Vernant, Vidal-Naquet, ji bo Memduh Selîm Beg jî em dikarin bipejirînin; “baş e, ya ku kesê/a trajîk ji yên din cuda dike çi ye? Hem ew yê/ya bi fikirîna hişane bûye desthilatê sirûştê, hem jî yê/ya ku nikare xwe bi rê va bibe ye, hem pêşbîn hem kor, hem sûcdar hem bêguneh… (Coşkun, 2017: 6).” Kuçuradî dibêje, “di bûyera trajîk da sûcek heye lê sûcdarê vê sûcê tune. Heke ji bo pirsa sûcdar kî ye, bersiveke zelal hebe, di wir da rengê ya ku trajîk e kêm e. Di rewşa trajîk da her kes sparteka xwe, ya ku divê were kirin kiribe jî, sûcek li holê dimîne; lê ji ber ku ev sûc jênerev e, ew nikare bi cihekî va were bicihkirin (Kuçuradi, 2009: 20).” Bi vî awayî dema ku xwîner vê deqa trajîk dixwîne, rasterast Memduh Selîm Beg sûcdar nake û ew sûc wek sûcê hemû merivayetîyê li holê dimîne. Memduh Selîm heta mirinê Ferîhayê ji bîr nake. “Lê birîna ser dilê wî naceribe. Ew her teze ye. Ew bi êş û jana birîna evînê dikeve xew û bi wan hişyar dibe. Ferîha bûye agir û ketiye pêsîra wî. Ferîha her pê re ye. Li her derî. Her saniye û deqîqe (Uzun, 2005: 191).”

Piştî mirina Memduh Selîm Beg Ferîha zewacê dike. Lê ew zewaca wê zewaceke ne bi dilî ye. “Ferîha, Edîb Aswar ra zewac kiriye. Ew çerkezekî Urdînî ye. Ferîha bi yekî dewlemend, kalemêr, xwedîyê du jinan, nexwende, qozikxwar û rûtirşekî ra zewicîye. Keçikeke mîna Ferîhayê, delal, xweş perwerdebûyî, mûsîkşînas, çawa dikare xwe qetl bike (186).” Memduh Selîm

Beg û dostên wî li ser vê hilbijartina ecêb ya Ferîhayê diponijin lê tênagihîjin û ew vê hilbijartina wê wek xwekuştinek pênasedikin. Daxwaza Memduh Selîm Beg ya vegera Antakyayê hatiye pejirandin û ew vedigere Antakyeyê. Memduh Selîm li pey Ferîhayê dikeve, bi alîkarîya Rûşen Bedirxanê agahîyek ji Ferîhayê ra dişîne ku ew ji mêrê xwe veqete were bi wî ra bizewice. Lê Ferîha vê napejirîne. Edet û tore destur nadin ku Ferîha vegere. Ferîha rewşa xwe wiha rave dike: "Min xwe kuşt, xwîngê, min xwe kuşt. Ez êdî nikarim ji kek Memduh re jî bibim yar. Lê ez ji kekê Memduh re nebûm yar, herweha ji kesekî din re jî nebûm...(192)."

Evîn, di dîroka merivayetîyê da hêzeke herî xurt, herwiha hêzeke çêker û wêranker e. Nivîskar di heman demê da, bi vê deqê, hêz û wêrankerîya evînê radixe li ber çavan. Piştî ku Ferîha dibihîze ku Memduh Selîm Beg miriye, dil û mêjîyê Ferîhayê belawela dibin. Ew, ber bi rewşa trajîkê va dixijike. Evîna Ferîhayê têk diçe. Nirxeke berz ya Ferîhayê, ew nirxa pak û pîroz tune dibe. Ferîha, dikeve di nav berberîya dil û mêjî. Li hemberî tunebûna evînê, tunebûna Ferîhayê sekinîye. Ew, çalakîya xwe ber bi dilê xwe va pêk tîne. Ferîha berdêla tunebûna evînê, dike ku bi tunebûna xwe va pêkbîne. Ew, biryar dide û xwe bi awayeke din dikuje. "Memduh abi, ez ji kesî re nebûm yar. Eger min quwet û hêz hebûya, min dê xwe bikuşta. Lê ez tirsok derketim û min xwe bi awayekî din kuşt (181)." Ew, gîyana xwe ya bi evînê dagirtî dikuje, êdî dibe mirîyeke jîndar. Herwiha herdu jî wek miriyên jîndar, li ser rûyê erdê dimînin.

Destaneke Kurdan ya ku bûyereke trajîk dihewîne ya *Binevşa Narîn*, di jîyana Ferîhayê da karîgerîyek dike. Memduh Selîm dema pêş, li Antakyayê Ferîhayê dîbîne, Binewşa Narîn tê bîra wî. Piştra dibin destgirtî, destana Binevşa Narînê hînî Ferîhayê dike. Ew destana trajîk ya Binevşa Narîn û Cembelî di jîyana wan da dubare dibe. Rûşen Xanim ji cem Ferîhayê vedigere, tê agahîya neyînî dide Memduh Selîm Beg û wî rexne dike.

> Ax Memduh Beg, ne tu û ne jî mêrên kurd, kes ji halê jinan fahm nakin. Hûn qet nizanin, tênagihên ew çi difikirin, çi hîs dikin... Îcar tu dizanî, Memduh Beg, ev fikir ji kû ketiye serê Ferîhayê?" "Naxêr, ez pê nizanim..." "Binevşa Narîn, Memduh Beg, Binevşa Narîn... Te dastana Binevşa Narînê hînî Ferîhayê kiriye. Ew ji Binevşa Narînê hîn bûye ku xwe bi saxî bişîne axa reş (193).

Dema ku Memduh Selîm Beg vedigere û daxwaza hevgihanê dike, wê demê Ferîha li dijî nirxa evînê, nirxa rewîştê hildibijêre û herçiqas ji Memeduh Selîm bi bengînîyeke xurt hezbike jî ew li ser nirxa rewiştî disekine û nirxa rewiştî wek nirxeke sereta digire. Zagonên civakî yên rewiştî, adet û tore tê hilbijartin. Ferîha, ji zewaca xwe ya ku tê da dildarî tune ra rêz digire û ji hevjînê xwe û malbata xwe ra sedeqetê nîşan dide û nirxa rewiştîyê hildibijêre. Memduh Selîm Beg ditemire û dikeve di nav bêdengîyekê.

Bi vî awayî trajîka ku puxta gerdûnê da heye û di bûyer û çalakîyan da xwe nîşan dide, tiştek hînî merivayetîyê dike. Bonnard wiha tîne ziman: "Tragedya, jê têgihîştina hişmendîya êşa merivayetîyê ye (2006: 11)." Êşa ku di berhema trajîk da derdibe, li ser bîner, xwîneran va têgihîştinek û hişyarbûnek pêk tîne. Meriv, bi rêya trajîkê ji êşa merivayetîyê têdigihîje. Ji vê deqa trajîk êşek derdibe, dilê xwînerên deqê ji ber serpêhatîya Memduh Selîm û Ferîhayê dişewit in. Herwiha tirsek di dilê xwîner da peyda dibe ku tu kes naxwaze ku bikeve rewşeke wiha. Xwîner, ji êşa ku di puxta hebûnê da heye haydar dibe. Dilşewatî û tirs, hêmanên girîng yên tragedyayê ne, ya ku trajîk e bi van hêmanan li ser kesan karîgerî dikin. Aristoteles, tirs û dilşewatîyê ji hêmanên herî girîng yên tragedyayê dıde nîşan. Heke leheng bi çalakîyên xwe di dilê xwîner, bîner yan jî guhdêran da tirs û dilşewatîyek pêk bîne, ew ji bo leheng li ber xwe bikevin, êş û jan bikişînin, wê gavê

leheng dikare bibe lehengê trajîk. Ew dibêje, "armanca tragedyayê paqijbûn, xweru bûn, valabûn û xwe rehetkirin e ku ew jî bi dilşewatî û tirsê peyda dibin. Bi dilşewatî û tirsa ku di derûnîyê da diqewimin, gîyanê ji bengînîyan paqij dikin. Temaşakerê tragedyayê dema ku lîstikê temaşa dike, ji alîyê derûnî û hişî va paqij dibe (catharsis) (Aristoteles, 2017: 29)." Bi van gotinan Aristoteles, alîyê rewiştî ya trajîkê nîşan dide. Di navbera karakterê/a trajîk û bîner/xwîner da manendîyek saz dibe û ew xwe di dewsa karakterê/a trajîk da xeyal dikin, yan jî hîs dikin. Ew, bi awayekî rewiştî bandor li wan dike, di wan da dilşewatî û tirsê der dike û di encamê da xwepaqijî û xwerehetkirinek pêk tê. Lê "Nietzsche, ramana Aristoteles ya 'catharsis'ê û ya ku tragedya paqijîyê pêk tîne napejirîne. Ew, nirx dide nêrîna feylosofên berîya Sokrates, yên Îyonyayê. Bi wî, hilşandina demê bi tragedyayê nayê rastkirin, yan jî telafîkirin, bes ew tê fehmkirin. Tragedya di pûxta xwe da reşbîn (pesimîst) e. Hebûn tiştekî ecêb e, meriv jî xêvik e. Nêrîna trajîk ji bingeha agahîyên reşbîn tên derxistin. Ya trajîk, ji bo êşa hebûnê nabe derman, tenê hêz û kûrahîya vê êşê bi her kesî va dide nasîn (Ji Nietzsche neql: Dienstag, 2008: 138)." Tê dîtin ku Nietzsche, nêrîna ku tragedya/trajîk derûnîya merivan paqij û aram dike, ji alîyê tevgera rewiştî va hînker e û rewiştê hîn dike, napejirîne. Trajîk ne derman e, ew pak nake, bes hêz û kurahîya êşa hebûnê dide nasîn. Bi xwendina vê deqa trajîk, di dilê xwîneran da tirs û dilşewatîyek derdibe. Xwîner ji êşa ku ji rewşa trajîkê derdibe, herwiha ji êşa merivên ku ji ber pirsgirêkên evîn û nasnameyê êş dikişînin haydar dibin. Mirina bav û dêya Ferîhayê, êşa wê bêtir kurtir dike. Memduh Selîm jî tê şînê û li wir hev û du dibînin.

Nîvê Şevekê agir bi mala bav û dêya Ferîhayê dikeve. Ew, her du di agir da dişewitin. Di şîna wan da Memduh Selîm û Ferîha hev dibînin. Ferîha dibêje: "…te ez sê car kuştim... Cara pêşîn, gava min bihîst ku tu şehîd ketiyî, ez mirim. Cara duwemîn, gava ez zewicîm, ez mirim. Cara sêyemîn, gava min bihîst ku tu sax î û vegeriyayî Antaqiyayê, ez careke din mirim... Ez mirî me… (Uzun, 2005:198)." Memduh Selîm dike ku li ber dilê Ferîhayê da were, lê neçarî. Ferîha: "…ez ji kesî re nebûm yar. Eger min quwet û hêz hebûya, min dê xwe bikuşta. Lê ez tirsok derketim û min xwe bi awayekî din kuşt (198)."Memduh Selîm: "Ez ê heta mirinê li hêviya te bim." Dîsan girî. Lehiyek ji hêstiran. Her du bi hev re (198)."

Memduh Selîm Beg, di kavilka xwe da bêdeng li benda mirinê ye. "Bêdengîya lehengê trajîk di xwe da wateyek dihewîne. Ew ne tenê ji ber têkçûnê bê deng e, di heman demê da ji ber tenêtîyê jî ew bêdeng e. "Êdî mirin ji bo lehengê trajîk layiq e. Ji ber ku ew dizane ku ji nav civakîbûnê û ziman hatiye avêtin, mirin ji bo leheng dibe teşeya tekane ya hebûnîya merivîyê. Bêdengîya leheng, dibe bîngeha îfadeya vê hebûnê (yan jî tunebûnê) (Dienstag, 2008: 145)." Di salên çilî (1940-49) yên jîyana wî da guherîn çênabe. "Hesret, qahr û jan; sê sitûnên esasî yên payiza umirê Memduh Selîm Begê (Uzun, 2005: 203)." Memduh Selîm Beg, ber bi kalbûnê va diçe, heval û hogirên wî dimirin. Hevalê wî yê dilsoz Celadet Alî Bedirxan 1951an û bavê wî 1953an da koça dawîn dikin. Memduh Selîm Beg êdî kal e, bi daxwaz û zora hevalên wî zewaceke sembolîk pê tê kirin. Di dilê wî da bes Ferîha heye. Ew ji Ferîhayê ra dinivîse:

> Canim Ferîha, ev bû demekê ku ez ji te re name nanivîsim. …Ne tu û ne jî ez, em di vê dinya malkambax de nebûn mesûd û bextiyar. Evîna me xweş, paqij û zelal bû. …Lê mixabin, ji ber dînîtiya min, me xwe gîhand ber siya wê. Bi tenê ber siya wê. Ne wê bi xwe. Ez niha li ser riya koça dawîn im. Jîna min bû koçeke bêdawî. Lê niha, êdî ez digihêm dawiyê. Tiştekî heye ku tu divê pê bizanibî; ez çavekirî derim...(215).

Û nameyek ji Celadet Alî Bedirxan ra: "Mîr'ê min'ê ezîz, birayê min'ê axretê, tu dibînî, jîn çi bi me dike? Ez hê jî li vî aliyê dinê me, hê jî ji te bi dûr. Lê zêde nema. …Eger em careke din

bihatina vê dinya malkambax, me jîneke weha, dîsan, qebûl bû. …Em dê, dîsan, xwediyê eynî qayide û prensîban bûyana...(217).” Memduh Selîm Beg hêvîya mirinê ye. “Sal 1974 textê xwe yê razanê dibe pirtûkxaneya xwe û dixwaze ku mirin wî li pirtûkxaneyê da bigire. Dinya pirtûkan yê bibe derîyê axiretê (218).”

“Taya mirinê. Taya dawîn. Bi dû taya hêviyê, taya welatê xerîbiyê, taya evînê, taya bêkesî û bêgaviyê, taya bêhêvîtiyê re, niha ji taya herî dawîn...(223).” Memduh Selim Beg xwe radestê bêdengîya ebedî dike û koça dawî dike. Di bin balgîyê serê wî da di nav zerfekê da tayek ji pora Ferîhayê û çarîna Ehmedê Xanî:

“Kurmanc di dewleta dinê de
Aya bi çi wechî mane mehrûm?
Bîl cimle ji bo çi bûne mehkûm? (227).”

Encam

Mehmed Uzûn, yek ji wan romanûsên edebîyata cîhanê ye ku li ser merivên ji ber zext û tûndîya li ser nirxên nasnameyên xwe bertekeke merivî nişan dane, ketine di nav berxwedanekê, piştra, xizan, belengaz, koçber û sirgûn bûne, têk çûne û mirine, herwiha negihîştine mirazên xwe radiweste. Yek ji wan romanan *Sîya Evînê* ye ku Uzun di vê romanê da karakterekî dîrokî û yê xwedîyê nirxên bilind hilbijartiye. Ew, di vê romanê da bi hatina modernîte û pêkhateyên wê, li ser merivên ku ji alîyên nirxan va ketine di nav berberîyan û ber bi rewşên trajîk va xijikîne hurbûye û deqeke trajîk honandiye. Deqên trajîk êş û tirsek dide û têgihiştineke rewiştî di xwîneran da peyda dike. Ev deq, wek vexwendinek e, ku em li ser berberî û pirsgirêkên nasnameyan û rewşên trajîk yên ji ber van pirsgirêk û berberîyan derhatine biponijin. Herwiha, li ser êşa ku ji encama berberîya nasname û nirxên merivayetîyê derhatine û dertên rawestin û ji wê êşê têbigihîjin.

Uzun, di romanê da li dijî evînê pirsgirêkên nasnameya neteweyî cih dike ku bi vê jî balê dikişîne li ser pirsgirêka dijwar ya serdemê. Beberîya ku romana *Sîya Evînê* da heye, ji bo ji têgihîştina serdemê dîyardeyeke girîng e, herwiha ev roman rengê rewşa trajîk ya ku di romana Kurdîyê da cih digire, nîşan dide. Uzun, bi vê romanê, li ser rewşa trajîk ya Memduh Selîm Beg, rewşa trajîk ya gelê Kurd ya serdemekî jî radixe li ber çavan û çarenûsa karakterê trajîk û ya gelê wî bi hev va girêdide. Ji bo Kurdan çarenûseke dilşewat ya ku naguhere tê xêzkirin. Di romanê da rêvebirîya Osmanî ji holê radibe, Komara Tirkîyê ava dibe û bi vê guherînê pirsgirêkên nasnameyî, li ser jîyana rewşenbîrekî Kurd va tê vegotin. Roman, nasnameya Kurd ya ku tê binpêkirin, ya ku li hemberê vê rewşê dixwaze bi her carî bi serxwebûnekê xwe rapê bike, li ber xwe dide lê pêk nayê û bi têkçûnê bi encam dibe vedibêje. Lehengê romanê Memduh Selîm Beg xwe di navenda şkestinxwarin û pirsgirêkên neteweyî ya Kurdan da dibîne. Memduh Selîm û karakterên din yên romanê nirxên bala hildibijêrin, ew nirxên azadî, wekhevî, pirengî, serbestbûna zimanê zikmakî û hwd in. Ew, ji ber nirxên nasnameyê, sirgûn dibin, bê pere dimînin, dikevin di nav jîyaneke xizan û xetereyê û di dawiyê da di nav hesret û hêvîya vegerîna welat da li xerîbîyê dimirin.

Memduh Selîm Begê ronakbîrê Kurd û Ferîhaya bedew ya Çerkez, ji ber geşedanên nirxên modernîteyê, yên ku pirsgirêkên nasnameyên hevbeş deranîbûn, rêvebir û hilgirên nasnameyên hevbeş ji bo sazkirin û yekgirtîya nasnameyên xwe, qesta cih û canê yên din dikirin, ji paytextê welatê Osmanî direvin tên Antakyaya ku di bin destê Fransizan da bû, li wir rastê hev tên û dil berdidin hev. Destê hev digirin û dixwazin dawetek bikin û bigihîjin mirazê xwe. Lê di encama berberîya dil û mêjî da ya ku Memduh Selîm Beg dikeviyê, Memduh Selîm Beg û Ferîha bi rewşa

trajîkê va dixijikin. Ji ber ku ya ku trajîk e bê telafî ye, Memeduh Selîm Beg nikare têkçûna trajîk berevajî bike. Ferîha, têk diçe ku wê vê rewşê hîç heq nedikir. Herwiha Memduh Selîm Beg, him ji hêla nasnameyê va him jî ya evînê va têk diçe û di vê cihana kaxsar da dikeve di nav kavilkekê, ditemire, di nav bêdengîyekê da jîyana xwe xelas dike. Ew, wek karakterekî trajîk, yê pak û çak, yê xwedî nirxên bala, vê têkçûnê heq nedikir ku çarenûsa wî ya dilsoj, hê jî wek kelemekî ji dilê xwîneran da xwîn diherikîne.

Krûya trajîkê, him di jîyana rojane da û him jî di qada estetîka hunerê da xwe bi merivên cîhanê dide hisîn. Tu kes naxwaze ku dûçarê rewşa trajîkê be, wek karakterên trajîk bi rewşeke trajîkê va bixijike, lê hin kesên ku puxta trajîkê di xwe da dihewînin dikevin di nav vê rewşê. Memduh Selîm Beg jî mîna karakterên serdemên kevn yên wekî Oidipus, Antigone û hwd. karakterekî trajîk yê serdema nûjen e. Ya ku trajîk e, di qada nirxan da, di berberîya nirxan da xwe dide der. Kesên ku ne xwedîyê nirxan in ji trajîkê dur in. Trajîk, di avanîya cihana meriv da veşartiye û ew berberîya nirxan ya ku meriv ketiye di tê da ye. Karakterê trajîk yê ku di navberê da mayî ye. Ew kesê ku di navbera du tişt û du nirxên erênî da dimîne, dike ku xwe ji vê rewşê û ji navbermayînê, xelas bike. Tam jî di vê demê da ya ku trajîk e rû dide. Di navberê da mayîn, wî kesî mecbur dike ku yekî hilbijêre û çalakîyek bike. Ew kesê navmayî, ber bi alîyekî va hilbijartina xwe dike û çalakîya xwe pêk tîne. Memduh Selîm Beg jî di navbera hiş û mêjî da dimîne. Tam jî di wê demê da ya ku trajîk e xwe dide nişan. Lewra ew dixwaze bi Ferîhayê ra jîyana xwe bike yek, ew ê ku hesreta hêlîna xwe bû, dixwaze li ber peravê behra Wanê hêlînek ava bike. Memduh Selîm Beg, bextewerîya xwe, evîn û dilbera xwe di cî da dihêle, berê xwe da qada şer, ango mirin û mayînê.

Di romamê da nirxa ku tê windakirin ango tunekirin evîn e. Nirxa nasnameyê li pêş were girtin jî ew bi dest nakeve, lê dema ku ew bi dest nakeve, Memduh Selîm Beg, vedigere xwe bi evînê va bigihîne, lê ew jî ji dest çûye. Bi vî awayî karakterê trajîk wek rût û tazîyek li ser rûyê erdê bi tena sera xwe, xwe di kavilkekê da dibîne. Ew, di wê halê wêranîyê da lavayî ji Xwedê dike. Di vir da ew dîmenek ji merivê trajîk yê cîhanê xêz dike, merivê ku di puxta trajîk di xwe da dihewîne, yê ku nikare pêşî ya ku trajîk e bigire û vê rewşa trajîk berevajî bike.

Bi vê deqê wek karakterekî trajîk Memduh Selîm Beg, mîna karakterên trajîk yên din, di nav karakterên trajîk yên edebîyata cîhanê da cihê xwe digire, serpêhatîya wî ji cîhana trajîk û ji têgihiştina trajîk ya serdema nûjen ra dibe mînakek.

Çavkanî

Alver, Köksal (2006). "Edebiyat ve Kimlik", *Bilgi Sosyal Bilimler Dergisi*, (2), 32-43. Retrieved From http://dergipark.gov.tr.

Aristoteles (2017). *Poetika*, wer. Samih Fırat, İstanbul: Can Sanat.

Balcı, Yunus (2016). *Tanpınar: Trajik Bir Şair ve Şiiri*, İstanbul: Kesit.

Bilgin, Nuri (2007), *Kimlik İnşası*, İzmir: Aşina Kitaplar Yayınları.

Bodur, Ekin (2009). "Modern Kürt Romanında Bir Kurucu Yazar: Mehmed Uzun", İstanbul Bilgi Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Karşılaştırmalı Edebiyat Yüksek Lisans Programı, Karşılaştırmalı Edebiyat Bölümü, İstanbul.

Bonnard, Andre' (2006). *İnsan Ve Tragedya*, wer: Yaşar Atan, ç. 2, İstanbul: Evrensel Basım Yayın.

Coşkun, Berrak (2017). Trajik Kahramanı Trajik Yapan Nedir?, Felsefe-Yazın, 23, Ankara: Felsefeciler Derneği, 37-43.

Çığrı Yıldırım, Asiye, (2018), Servet-i Fünûn Romanında Trajik Durum, Bartın: Bartın Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Doktora Tezi.
Dalbay, R. S. (2018/2). "Kimlik" ve "Toplumsal Kimlik" Kavramı, *Süleyman Demirel Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Sayı: 31, 161-176.
Demirtaş Madran, H. A. (2012). "Sosyal Kimlik ve Ayrımcılık" *Ayrımcılık: Çok Boyutlu Yaklaşımlar*, Sosyoloji ve Eğitim Çalışmaları Birimi, İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
Dıenstag, Joshua Foa (2008). "Tragedya, Pesimizm, Nietzsche", *Cogito*, j: 54.
Eagleton, Terry (2012). *Tatlı Şiddet Trajik Kavramı*, İstanbul: Ayrıntı.
Fromm, Erich (1985). *Sevme Sanatı*, wer.: Işıtan Gündüz, İstanbul: Say Yayınları.
Glıcksberg, Charles I. (2004). *Avrupa Edebiyatında Trajik Görünüm*, Ankara: Hece.
Güvenç, B. (2010). *Türk Kimliği*, İstanbul: Boyut Yayıncılık.
Jusdanis, G. (1998). *Gecikmiş Modernlik Ve Estetik Kültür Milli Edebiyatın İcat Edilişi*, Wer: Tuncay Birkan, İstanbul: Metis.
Kuçuradi, İoanna (2009). *Sanata Felsefeyle Bakmak*, ç.4, Ankara: Türkiye Felsefe Kurumu.
…….... (2019). *Schopenhauer ve İnsan*, Ankara: Türkiye Felsefe Kurumu.
Maalouf, Amin (2000). *Ölümcül Kimlikler*, Wer: Aysel Bora, İstanbul: YKY.
Polat, Lokman (2021). *Nirxandina Berhemên Mehmed Uzun,* Van: Peywend.
Poole, Adrian (2013). *Trajedi*, wer. Hakan Gür, Ankara: Dost.
Özdemir, Cevdet (2001). Kimlik ve Söylem, *Osman Gazi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Dergisi.* j. 2.
Öztürk, Yücel (2007). Tarih ve Kimlik, *Akademik İncelemeler,* Cilt:2 Sayı:1.
Scheler, Max (2008). "Trajik Görüngüsü Üzerine", *Cogito*, j: 54, 237-245.
Sofokles (2009). *Eski Yunan Tragedyaları 3: Kral Oidipus*. wer: B. Tuncel, İstanbul: Mitos Boyut.
Sözen, Edibe (2019). *Kimlik, Demir Kafesten Plastiğe*, İstanbul: Profil Kitap.
Steiner, George (2011). *Tragedyanın Ölümü*, wer. Burç İdem Dinçel, İstanbul: İş Bankası Kültür Yayınları.
Şeriati, Ali (1992). *Kevir,* wer: Muhammed Nayif Şayir, Ankara: Fecr Yayınevi.
Uzun, Mehmed (2005). *Siya Evînê*, ç.5, İstanbul: İthaki.
Weeks, Jeffrey (1998). "Farklılığın Değeri", *Kimlik: Topluluk, Kültür, Farklılık*, wer: İrem Sağlamer, İstanbul: Sarmal Yayınevi.
Yiğit, R. İlke (2008). "Medeia'ya Acımak", *Cogito*, j: 54, 159-169.

Kurdiyat

Yıl/Sal/Year: 2022
Sayı/Hejmar/Issue: 5
e-ISSN 2717-8315
Doi: 10.55118/kurdiyat.1118723
Rûpel/Sayfa Page: 31-47

TEWSÎF Û DANASÎNA KEŞKÛLA KURDÎ YA LI PIRTÛKXANEYA MECLÎSÊ ŞÛRAYÊ ÎSLAMÎ

Yakup AYKAÇ

Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types: Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research Article

Dema Hatinê/Makale Geliş Tarihi/Received: 19.05.2022
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/: 17.06.2022

Yakup Aykaç Arş. Gör. Dr. Mardin Artuklu Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi
yakupaykac@artuklu.edu.tr
Orcid: 0000-0002-2602-484X

Atıf: Aykaç. Y. (2022). "Tewsîf û Danasîna Keşkûla Kurdî ya li Pirtûkxaneya Meclîsê Şûrayê Îslamî", Kurdiyat, 5, 31-47.

Citation: Aykaç. Y. (2022). "Description and Analysis of the Kurdish Kashkūl in the Library of the Islamic Consultative Assembly", Kurdiyat, 5, 31-47.

Kurte

Keşkûl yan jî mecmû'e, di wateya "berhemên berhevkirî" de tê bikaranîn ku yek ji wan çavkaniyên sereke ne di edebiyata kurdî ya klasîk de û roj bi roj girîngiya wan di biwarê akademîk de bêtir balê dikêşin. Bi peydabûna keşkûlên nû dewlemendiya edebiyata kurdî ya klasîk her ku diçe zêdetir dibe. Yek ji wan keşkûlan jî di *Kitabxaneyê Meclîsê Şûrayê Îslamî* de bi sernavê "Dîwanê Şêxê Kurdî" hatiye peydakirin ku li gor qerîneyan li herêma Hekariyê hatiye nivîsîn. Armanca vê gotarê ew e ku bi nasandina vê keşkûlê tevkariyê li cîhana zanista edebiyata kurdî bike. Wek rêbaz û metodolojî me di vê nivîsarê de li gor tewsîfa destxetan, analîza vê keşkûlê kir û şi'rên tê de yek bi yek tesbît kirin. Herweha me hewl da ji bo ku cih û girîngiya vê keşkûlê di nav çavkaniyên edebiyata kurdî ya klasîk de diyar bikin. Di encamê de me dît ku di vê keşkulê de bi tevahî yanzdeh şi'r hene û ji wan her nehên pêşîn bi kurdî, herduyên dawî jî bi farisî û tirkî ne. Ji wan nehan, şi'rên Melayê Bateyî û Mustefa Xan Beg cara ewil bi xêra vê nivîsarê dikevin cîhana akademîk ku ew jî girîngiya vê keşkûlê zêdetir dike.

Peyvên Sereke: Çavkaniyên edebiyata kurdî ya klasîk, mecmû'eya şi'ran, keşkûla kurdî, Pirtûkxaneya Meclîsê Şûrayê Îslamî, Melayê Bateyî (Bate), Mustefa Xan Begê Hekkarî (Pertew).

İran Meclis-i Şûra-yı İslâmî Kütüphanesindeki Kürtçe Keşkülün Tavsifi ve Analizi

Öz

Keşkül ya da mecmua, Klasik Kürt Edebiyatının ana kaynaklarından biri olup "derlenmiş eserler" anlamında kullanılmaktadır ki bu türden kaynakların akademik alanda önemi giderek dikkat çekmektedir. Yeni keşküllerin ortaya çıkmasıyla beraber Klasik Kürt Edebiyatının zenginliği de günden güne artmaktadır. Bu keşküllerden birisi de içerisindeki karinelerden hareketle Hakkari yöresinde yazılmış olduğunu düşündüğümüz "Kürt Şeyhin Divanı" başlığı altında *İran Meclis-i Şûra-yı İslâmî* Kütüphanesinde bulunan keşküldür. Makalenin amacı, bu Kürtçe keşkülü tanıtarak Kürt Edebiyatına katkıda bulunmaktır. Bu makalede yöntem olarak sözkonusu keşkül, yazma nüshaların klasik tavsifi yöntemine göre analiz edilerek yazma eserin önemli noktalarına değinilmiş ve içindeki şiirler tek tek tespit edilmiştir. Bununla birlikte sözkonusu yazma eserin Klasik Kürt Edebiyatı kaynakları arasındaki yeri ve önemi belirtilmeye çalışılmıştır. Sonuç olarak bu keşkülde toplamda on bir şiir tespit edilmiştir ki ilk dokuzu Kürtçe, biri Farsça ve sonuncusu ise Türkçedir. Bunlardan Molla Hüseyin Bateyî'nin ve Mustafa Han Bey-i Hakkari'nin Kürtçe şiirlerinin bu yazıyla birlikte akademik dünyaya kazandırılması mezkûr keşkülün ehemmiyetini göstermesi açısından önemlidir.

Anahtar Sözcükler: Klasik Kürt Edebiyatının kaynakları, şiir koleksiyonu, Kürtçe keşkül, İran Meclis-i Şûra-yı İslâmî Kütüphanesi, Molla Hüseyin Bateyî (Bate), Mustafa Han Bey-i Hakkari (Pertev).

Description and Analysis of the Kurdish Kashkūl in the Library of the Islamic Consultative Assembly

Abstract

Kashkūl or *macmū'ā* means "compiled products" which are one of the main sources in classical Kurdish literature and their importance in the academic field is becoming more and more important. With the advent of new collections, classical Kurdish literature is becoming richer day by day. One of these *kashkūls* has been found in the *Library of the Islamic Consultative Assembly* under the title "Dīwān of the Kurdish Sheikh" which has been written in the Hakkari region according to the indications. The purpose of this article is to contribute to the Kurdish literature by introducing this topic. As a methodology, we have analyzed this collection according to the description of manuscripts in this article and identified the poems in it one by one. We also tried to clarify the place and importance of this subject in the sources of classical Kurdish literature. As a result, there are eleven poems in total in this *kashkūl*, of which the first nine are in Kurdish, one in Persian and the last in Turkish. The fact that the Kurdish poems of Mullah Hussein Bateī and Mustafa Khan Beg were brought to the academic world with this article is important in terms of showing the importance of the *kashkūl*.

Keywords: Sources of Classical Kurdish Literature, macmū'ā of poetry, Kurdish kashkūl (macmū'ā), Library of the Islamic Consultative Assembly, Mullah Hussein Bateī (Bate), Mustafa Khan Beg Hakkarī (Pertew).

Destpêk

"Keşkûl" di zimanê farisî de bi wateya tûrik û kîsikê ye ku zimanê erebî de beramberî mecmû'eyê tê. Muellîfên keşkûlan gelek caran di proseya xwendinên xwe de tiştên balkêş û nû bi awayekî nerêkûpêk di wan berheman de dane ser hev (Elmalı, 2002: 324). Di edebiyata tirkî de berhemên bi vî rengî re "cönk" hatiye gotin ku li gor hinekan di wateya keştî û sefîneyê de ye lêbelê ji aliyê edebî ve teqabilî mecmû'eyê tê (Gökyay, 1993: 73). Mecmû'e di nav çavkaniyên edebiyata klasîk de yek ji wan berhemên pêşîn û sereke ne ku roj bi roj nirxa wan bêtir derdikevin holê. Mecmû'eyên şi'ran hem bi zanyariyên xwe yên nû hem jî bi erka xwe ya piştrastker û temamker a berhemên edebî yên heyî, bala lêkolîneran dikêşe ser xwe û bi vî awayî dibe mijara lêkolîn û xebatên nû. Helbet xebatên bi vî rengî ji bo edebiyata klasîk tevkariyên girîng in. Li dor vê çarçoveyê wek girîzgahekê ger em li ser bêjeya "mecmû'e"yê rawestin wê demê dibînin ku ew peyveke erebî ye ji bêjeya "cem'ê" (berhevkirin, komkirin, anîna ba hev) darijiye. Îro ev îfade di lîteraturê de bi wateya "berhemên komkirî û berhevkirî" tê bikaranîn (Develioğlu, 2001: 96). Mecmû'e dikare wek defterên nivîskî bên hizirkirin ku ew ji metnên mensûr an jî menzûm pêk hatine û aîdê yek an jî zêdetir nivîskar/şairan in. Bi kurtî mecmû'e ji tevahiya metnên komkirî re tê gotin ku ew metin aîdî kesên cihê ne û herweha hevbeşî yan jî têkiliyek di navbera wan metnên heyî de heye (Uzun, 2003: 265).

Cihê keşkûlan ji bo çavkaniya edebiyata klasîk û dîroka edebiyata klasîk gelek girîng in, ji ber ku her keşkûlek bi tena serê carna dikare bibe belgenemeyeke girîng. Gelek keşkûlên şi'ran di tarîxa edebiyata kurdî de hene. Ji ber ku keşkûlên şi'ran di xwe de gelek şi'r dihewînin, ji vê hêlê ve ji bo edebiyata klasîk yek ji çavkaniyên bingehîn in. Carna mirov di wan keşkûlan de rastî şair an jî şi'reke nû tê ku ew yek ji bo edebiyata xwe dibe cihê şanazî û dewlemendiyê. Hin caran di wan keşkûlan de bi saya haşiye, derkenar û perawêzên biçûk derbarê nivîskaran de agahiyên girîng peyda dibin. Helbet ev rê û qayîde, bi heman şiklî hem ji bo edebiyata kurdî ya klasîk û hem jî lêkolerên edebiyata kurdî derbasdar in (Aykaç, 2021: 26). Di vî biwarî de *Baxê Îrem* a Doskî (2020) xebateke bi vî rengî ye ku di keşkûlan de şi'rên kurdî peyda kirine û anîne ba hev[1].

Çawa ku tê zanîn di arşîvên gelek dewletan de destnivîs û belgenameyên derbarê ziman û edebiyata kurdî de hene. Di vê çarçoveyê de li hin pirtûkxaneyan xebatên bîblîyografîk jî hatine kirin. Bo nimûne li Almanyayê doktoraya F. Kemal (1970) ya li ser destnivîsên kurdî, xebateke bi vî rengî ye. Herweha li Îranê jî xebatên bi wî rengî hatine kirin ku yek ji wan jî xebata bîblîyografîk a H. Bîdekî (2018) ye ku rê li pêşiya lêkoleran vekiriye. Ew keşkûla ku bûye mijara vê nivîsarê jî li Tehranê di Pirtûkxaneya Meclîsê Şûrayê Îslamî de bi sernavê "Dîwanê Şêxê Kurdî" û di bin hejmara 87359an de hatiye qeydkirin. Herçiqas ji ber nezanîna kurdî bi şaşî wek "Dîwan" hatibe tewsîfkirin jî di esasê xwe de keşkûleke şi'rên kurdî ye. Lewma di vê nivîsarê de berê em ê li ser tewsîfa vê keşkûlê bisekinin û piştre behsa naveroka wê bikin û şi'rên tê de yek bi yek bidin nasandin. Di vê keşkûlê de du şi'rên nû hene ku cara ewil bi xêra vê xebatê di kovareke akademîk de derdiçin û dikevin lîteratura edebiyata kurdî ya klasîk û cîhana akademiyê.

1 Di kurdî de li ser keşkûlan hin xebat hatine kirin ku mirov dikare navê wan weha bide: Qeredaxî, *Bûjandinewey Mêjûy Zanayanî Kurd le Rêgey Destxetekanyanewe*. c. I; Adak (2009), Şeyh Cüneyd-i Zokaydî ve Mahtut Bir Şiir Mecmuası; Karak (2021), Bi Mexlesa "Feyzî" Du Helbestên Nû yên Şêx Mistefayê Sîsî; Subaşı (2020), Destnivîsên Mecmû'eyên Kurd (21-22-47) ên di Koleksîyona Alexandre Jaba de (Nûbar û Eqîdeya Îmanê); Aykaç (2021), Kolxaniya Veşartî: Keşkûla Qesîdeyên li dor Medreseya Mala Şêx Mustefayê Sîsî. Ji van xebat û lêkolînan bi taybetî di yên Doskî û Qeredaxî de behsa gelek mecmû'e û keşkûlên kurdî hatine kirin û hin şi'rên nû jî hatine îşaretkirin.

1. Tewsîfa Keşkûlê

Di biwarê destnivîsariyê de danasîna nusxeyên destxet bi rê û rêbazeke diyarkirî tê kirin ku jê re tewsîfa nusxeyê tê gotin. Em ê jî di bin vê sernavê de vê keşkûlê li gor tewsîfa nusxeyê ya şablona klasîk bidin nasandin, taybetiyên derekî û hundirî yên nusxeyê li vir rêz bikin.

Navê Berhemê ya Fermî : Dîwanê Şêxê Kurdî

Cureyê Berhemê : Keşkûl / Mecmû'e

Navê Pirtûkxaneyê : Kitabxaneyê Meclîsê Şûrayê Îslamî

Jimareya Qeydê : 87359

Zimanê Berhemê : Bi kurdî (kurmancî)

Mustensîx/Nivîskar : Nehatiye nivîsîn.

Taybetiyên Bergê : Bergê muqawwa ye lê piştre hatiye restorekirin.

Taybetiyên Kaxezê : Rengê kaxezê zereke qehweyî ye û di her rûpelê de 8 rêz hene. Di navbera herdu rêzan de bi hibra sor xêz kêşane. Mustensîx piştî wr. 109b-yê bi xetên sor riste yan jî beyt dabeş nekirine.

Hejmara Wereqan : Bi tevahî 134 wereq in.

Hejmara Rêzan : Nêzîkî 1100 rêz in.

Ebadên Destxetê : 21x15,5 cm.

Cetwel : Li dora her rûpelekê çarçoveya sor hatiye xêzkirin. Heta dawiya wr. 131a-yê di navbera her risteyekê de jî xêz hatiye kişandin.

Dîroka Îstinsaxkirinê : Tuneye.

Rengê Murekkebê : Bi murekeba reş û sor hatiye nivîsîn.

Pêşiya Nusxeyê : Bi muşa'ereya Melayê Cizîrî û Mîr 'Imamedînê Hekkarî dest pê dike:

Ji destê şeker-amizan seraser ẋerqê mestî me
Semen bû û dil-awizan bi reyḥanê xwe bestî me
Ji tora fitne-engizan du ejder mestî gestî me (wr. 2a)

Paşiya Nusxeyê : Di dawiya keşkûlê de şi'reke tirkî heye ku beyta dawî weha ye:

Ḫaber almaz hani mîhrab nice evet der canın mihrab
Sana ḳaynar ḳanı mihrab tazeden dildar-ı güzel

Sernav : Tenê di serê qesîdeya Mustefa Xan (Pertew Beg) de sernavek hatiye danîn: "Muṣtefa Xan Beg Fermayed" (wr. 131a). Di serê du menzûmeyên Feqiyê Teyran de jî du besmele hatine danîn.

Derkenar : Di gelek cihan de li şûna sernavan bi murekkeba sor haşiye û perawêz hatine nivîsîn. Bo nimûne di muşa'ereya Melayê Cizîrî û Mîr 'Imadedîn de di kêleka her sêristeyê de yan "Înşaê Mela" yan jî "Cewaba Mîr" nivîsiye. Dîsa di serê muxemmesa Bateyî de jî li kêlekê nivisiye "Bate Fermayed" (wr. 13b).

Te‘qîbe/Payende : Di her wereqê de li bin rûpela milê rastê hatiye danîn.

Taybetiyên Din : Di serê kitêbê de (wr. 1b) bi çend risteyên farisî xwestine ku derbarê vê berhemê de agahî bidin. Di rûpela 19b-yê de du mohr hene ku tam nayêne xwendin. Ji bilî vê, di dawiya munace‘tên Mustefa Xan Beg de beytek li ser navê katib/mustensîx hatiye nivîsîn.

2. Naveroka Keşkûlê

Ev berhem herçiqas di katalogkirina *Kitabxaneyê Meclîsê Şûrayê Îslamî* bi sernavê “Dîwanê Şêxê Kurdî” hatibe qeydkirin jî di eslê xwe de keşkûleke kurdî ye û gelek şi‘rên kurdî di xwe de komkirine, lewma ji bo vê berhemê pênaseya keşkûlê di cih de ye. Di serê vê keşkûlê de bi zimanê farisî îbareyek hatiye nivîsîn ku wêne û deşîfrasyona wê li jêrê ye:



این کتاب بی ربط که من هیچ

از کلمات آن چیزی استنباط نمیکنم

نمی‌دانم متعلق به کی است

تعلق با ینجانب که ندارد

از برای اطلاع آقایان قلمی و حریر شد.

از کثرت عدم هواس نمی‌دانم تاریخ چیست.

Ev pirtûka bê rebt (bê nîşan) ku ez ti tiştekî ji peyvên wê fehm nakim, nizanim a kê ye, ya min nîne, ji bo agahdariya camêran hat nivîsîn.
Hişê min ewqas tevlihev e ku nizanim dîrok çi ye!

Eger em hinekî li ser vê îbareya farisî bisekinin dê di cih de be. Li gor vê destnivîska farisî mirov bi rihetî dikare şîroveyeke weha bike ku ev keşkûl bi awayekî ji awayan ji destê mustensîxê xwe derketiye û ketiye destê mirovekî kurdî-nezan. Wî jî xwestiye ku hin îzahatan bike lê ji ber nezanbûna xwe ya kurdî (kurmancî) nekariye wê jî bike. Herweha ji risteya dawî jî tê fehmkirin ku ji vê rewşê nerehet bûye û nema kariye dîroka nivîsandina keşkûlê tesbît bike.

Em dibînin ku piştî vê destnivîska farisî, keşkûl bi muşa‘ereya Melayê Cizîrî û Mîr ‘Imadedînê Hekkarî dest pê kiriye. Ev muşa‘ere ji wereqa 2a-yê dest pê dike û heya wereqa 13b-yê dewam dike. Di vê keşkûlê de ev muşa‘ere bi van risteyên Melayê Cizîrî weha dest pê dike:

Înşaê Mela
Ji destê şeker-amizan seraser ẋerqê mestî me
Simen-bû û dil-awizan bi reyḥanê xwe bestî me
Ji tora fitne-engizan du ejder mestî gestî me

Cewaba Mîr
Du reşmaran semen ber bû me dil maye di xiyalê da
Ku sunbul hat(i) ker ker bû di ber goşên hilalê da
Ji ‘eksa saqî enwer bû şeraba me di peyalê da

Lê ji vê muşa‘ereyê diyar dibe ku du gotinên Mela û du gotinên Mîr jê ketine[2]. Li gor hejmara rêza rûpelan eger em hesabekê bikin, wê demê em ê bizanin ku wereqek li pêşiya vê keşkûlê bi awayekî jê qetiyaye. Helbet îhtimal heye ku di destpêka vê keşkûlê de hin şi‘rên din jî hebin, ger wisa be, wê demê em dikarin bibêjin zêdetir wereq jê ketine. Em li ser vê keşkûlê hinekî din bisekinin dê çêtir be. Çawa ku li jorê jî dixuyê di serê her sêristeyê de navê şair hatiye nivîsîn ku ji bo Melayê Cizîrî îfadeya “Înşaê Mela” û ji bo Mîr Îmadedînê Hekkarî jî îfadeya “Cewaba Mîr” bi murekeba sor hatiye nivîsîn[3]. Ji van jî tê fehmkirin ku nivîskarê wan haşîye û perawêzan yekî zana û şarezayê edebiyata kurdî bûye. Herweha hezkerekî şi‘rên kurdî bûye ku wî gelek şi‘rên ji herêma Hekkariyê civandine.

Di vê keşkûlê de wek şi‘ra duyem a Melayê Bateyî heye ku bi murekkeba sor sernavekî biçûk weha hatiye diyarkirin “Bate Fermayed”. Ji vir em têgihîjin ku ev muxemmes a Melayê Bateyî ye. Jixwe di benda dawî de wek mexles “Bate” jî derbas dibe û ev jî cara duyem piştrast dike ku ew şi‘r a Melayê Bateyî ye. Muxemmes ji wereqa 13b-yê dest pê dike û heya 17b-yê didome. Melayê Bateyî ev muxemesa xwe bi behra remel û bi wezna *fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun* nivîsiye. Ji ber ku ev muxemmes cara ewil bi xêra vê keşkûlê di kovareke akademîk de derdiçe, lewma em ê temamê wê transkirîbe bikin ku weha ye:

Bate Fermayed

Hûn li min hişyar(i) bin îro gelî yarê di min
Sergiran hatine cenga şah(i)xendkarê di min
Çar xiya û çar veşarî ṣubḥ(i) êvarê di min
Merḥeba hatî xudana herdu şehmarê di min
Bê li ser çavê di min tuy barê serbarê di min

Perdeya dêmê hilanî nazika gerden ṣedef
Beyreq û ala û sinceq bûne seywan ṣef bi ṣef
Ẓahirî qatil ew e le‘l û lebeş dermanê xef
Hat û tîr havête min teşbihê tîra Xan Şeref
Xud dewa bexşî ‘ezîzem tuy kes û karê di min

Nêrgis [û] reyhan û çîçek cumle pêşkêşê di min
Ta ebed ew zulfê xal in ḥakimê rûḥa me bin

2 Di hemû dîwanên Melayê Cizîrî yên çapkirî de ev muşa‘ere, digel hin guhertoyên biçûk, bi vî şiklî dest pê dike (Melayê Cizîrî, 2012: 444):

Mela: Selama min senaxwanî sehergeh gewher efşan bit
Bi xidmet erzê sultanî ‘ebîr û ‘enber efşan bit
Bi sûret emrê subhanî ser-elqabê zer-efşan bit
Mîr: Selama sani‘ê qadir Mela da pê mu‘etter bê
Muferreh bit me lê xatir peyapey lê mukerrer bê
Ji cama xatirê ‘atir me jê ayîne enwer bê

3 Îfadeyên bi vî rengî di destnivîsa *Dîwana Melayê Cizîrî* de derbas dibin ya ku Martin Hartmann biriye Almanyayê û wekxwe/faksîmîle çap kiriye. Di wir de ji bo yên Mela nivîsiye “Sewala Mela”, ji bo yên Mîr jî nivîsiye “Cewaba Mîr”. Bnr. Hartmann, *Li ser Edebiyata Kurdî & Li ser Melayê Cizîrî*, r. 130.

Muḫbet û derdê evînya te li min her zêde bin
Şerḫê ṭûmarêd ẋemem sêṣed muderrîs ku hebin
Kes neşêtin întiha ket şerḫê ṭûmarê [di] min

Xwezya vê koçk û serayê ‘eyş û nûşa bade lê
Ta siḫer coş û ṣeda jê çûne burca ḫemelê
Min diya ez bê bizanim lezzeta vê menzelê
Cotekî bazî vebestî şah û ṣeyyadan welê
Seyd û kebik dil xiyal e baz û bazdarê di min

Tîr baranê fuẋanem semtê her heftê asiman
‘Aqibet qeṭ rû neda min bextê ẓalim el-eman[4]
Namiradê dame qismet çerxê hem murwet bizan
Min di ‘işqê da sefer kir pêlekê lew nagihan
Çûn bi çaha ḫeyretê da koç û koçbarê di min

Sal û mah û ḫeftiyan ba zulfekî dilbend im ez
Gulşena gul tê ez im îro ‘eceb gulxend im ez
Ba xiyalê rûyê dilber qani‘ê xwersend im ez
Ku çi ẓahir ez kesad im şahê dewletmend im ez
Vê di qeṣra ba xiyalê durr û mirwarê di min

Ba segê dergahê yar im dê bikem ez ulfetê
Ta ebed ‘umrê me bêtin dê bikem her xidmetê
Çaverê dîdarê yar im hêvîdarê reḫmetê
Bate û jar û feqîrê sot bi narê firqetê
Çav tijî rohnik ji bo min yar û ẋemxarê di min

Di vê keşkûlê de wek şi‘ra sêyem museddesa Ehmedê Xanî hatiye nivîsîn ku ji wereqa 18a-yê dest pê dike û di wereqa 19a-yê de diqede. Eslê vê şi‘rê bi temamî ji heft bendan pêk tê ku heta niha di gelek çavkaniyan de jî hatiye nivîsîn[5], lêbelê di vê keşkûlê de tenê herdu bendên vê museddesê hatiye nivîsîn ku ev jî beramberî 12 risteyan tê. Benda ewil weha ye:

Ey derîẋa mame tenha ez di şemsa xawerê
Xan û man têk bûne ẓulmet paşî wê dêm-enwerê
Paşê lêvêt wê venaxûm muṭleq ava kevserê
Min nevêt dunya bi carek paşê wê sîman-perê
Ger bizanim ez di ḫeşrê dê nebînim dilberê
Cennetê dê pê çi kem pê wer bikem xakusterê

Di vê museddesê de risteya çaran li gor dîwanên Ehmedê Xanî yên ku hatine çapkirin, di benda sêyem de cih digire û li gor wan dîwanan di benda ewil de li şûna wê risteyê di ya Yıldırım (2014; 227) de “Bêqerar im şubhê zeybeq bê ewê sîmenberê”; di ya Doskî (2016: 78) de risteya sê û çaran cih guhertine lê weha nivîsiye “Bê qerar im şubhê zîbeq bê ewê sîmen-berê”. Lê piştî vê

4 D: ‘Aqibet qeṭ rû neda min bextê ẓalim el-eman û el-eman.

5 Hinek ji wan çavkaniyan em dikarin weha rêz bikin: Varlî, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî yêd Mayîn*, c. II, r. 103-106; Yıldırım, *Dîwan -Ehmedê Xanî Külliyatı IV-*, r. 227-228; Doskî, *Dîwana Ehmedê Xanî*, r. 78-79.

risteyê Doskî bi jêrenotekê diyar kiriye ku di daneyeke din a vê şi‘rê de weha gotiye: “Min nevê dunya bi carek...”.

Şi‘ra çarem a vê keşkûlê menzûmeya Şêxê Sen‘anî ya Feqiyê Teyran e ku ji wereqa 19b-yê dest pê dike û heta 102b-yê dewam dike. Mustensîx bi besmeleyê dest bi menzûmeyê kiriye[6]. Destpêk û dawiya vê menzûmeyê weha ye:

Bîsmîlleḥîrreḥmanîrreḥîm
Guh bidêrîn nuṭqa ‘aşiqî da ez bixûnim vê xeṭê
Ḥemd û ṯenaya Xaliqî subḥan ji şahê qudretê

Subḥan ji şahê Ẕulcelal fukrîme neqşê bê zewal
Ḥalê bê mecaz naête bal kamil tibit bi ulfetê
...
Mîm û Ḥê ṣot ji ‘işqehê di deh ṣed û sala sihê
Miksî ji wê mey mestihê ṭewîl diket ḥikayetê

Miksî ji ‘işqê ṣohtiye ew şi‘r bi şêxî nohtiye
Ḥalê xwe tê da gotiye di ‘eyn û lama hicretê

Di serê menzûmeya Şêxê Sen‘an (wr. 19b-yê) de du mohr hene ku bi zelalî nayêne xwendin ka yên kê ne û çi dinivîse li ser wan. Wêneyên herdu mohran li jêrê hatine dayîn.

Mohra yekem	Mohra duyem
	

Herçiqas nav û nîşanên herdu mohran tam diyar nebin jî mirov dikare bibêje ku ev keşkûl di pirtûkxaneya du kesên cuda de maye, anku bi zimanekî din em bibêjin, herî kêm du xwediyê vê keşkûlê çebûne ku mohra xwe wek îşaretekê lê dane.

Piştî menzûmeya Şêxê Sen‘an, di vê keşkûlê de qesîdeya Feqiyê Teyran a “Ey Av û Av” tê ku ew jî bi besmeleyê dest pê dike. Bi vê qesîdeyê em dibînin ku bi tevahî du besmele çêbûne di vê nusxeyê de. Ev qesîde ji wereqa 103a-yê dest pê dike û heya binê wereqa 114a-yê didome. Destpêk û dawiya qesîdeyê weha ye:

6 Menzûmeya Şêxê Sen‘an di xebata Sadinî (2012: 336) de 363 beyt in û di ya Yıldırım (2014: 218) de 362 beyt in. Herweha di koleksiyona A. Jaba de jî gelek şi‘r û menzûmeyên Feqiyê Teyran hatine qeydkirin ku di nav wan de yên Şêxê Sen‘an û Zenbîlfiroş jî heye (Aykaç, 2021: 54).

Bîsmîlleḥîrreḥmanîrreḥîm
Ey av û av ey av û av ma tu bi ‘işq û muḥbet î
Mewc û belan[7] tavêt belav bê sekne û bê raḥet î
…
Tê ḥeyretê sergeşte în qaîm li ser ehda xwe în
Lew deh ṭebeq li karê xwe în ḥetta wê roja ḥiżretê

Çawa ku qesîdeya Ey Av û Av diqede, bêyî ku navberek yan jî îşaretek hebe, di dewama wê de qesîdeya “Bi Çar Kerîman” dest pê dike. Li gor nusxeyê mirov wisa dizane ku herdu qesîde yek in, çunkî keş û ahenga wan herduyan wek hev in. Lê ji ber ku di kitêb û berhevokên berhemên Feqiyê Teyran de ew herdu ji hev hatine veqetandinê û wek du şi‘rên cuda hatine qebûlkirin, me jî wisa nirxand. Di vê keşkûlê de ev qesîde bi tevahî heft beyt in û di wereqên 114a û 116a-yê de cih digire. Destpêk û dawiya qesîdeyê weha ye:

Ti weṣfa heyûla meḥik în ti keza qedîm da qedim în[8]
Bi wechê ku sew Rebu‘l-‘alemîn ew mes`ele rast(i) li me tê

Rast e qewî ew mes`ele eslê tizanin mela
Roja ku bû Qalûbela ma hûn nebûn ti ḥiżretê
…
Barî emanet xaṣ biken er xwar tibit hûn rast biken
Xwe rû-sipî xilaṣ biken ji peşîmaniya axiretê

Mîm û Ḥê bi ‘işq û muṭalan hindî ji wan fikir xiyalan
Rast tiket bend û miṯalan ṣa‘irê neṣîḥetê

Di dewama van herdu qesîdeyan de menzûmeya Zenbîlfiroş tê ku ew jî ya Feqiyê Teyran e. Ev menzûme ji wereqa 116a-yê dest pê dike û di wereqa 130b-yê diqede ku bi tevahî wek 51 beyt in[9]. Li gor vê keşkûlê destpêk û dawî weha ne:

Ey dil were dîsan bi coş carek ji camê mey binoş
Da bibêm qiṣṣeta Zenbîlfiroş da seh biken ḥikayetê

Zenbîlfiroş lavê riwal e bi kulfetê ehlê ‘eyal e
Ḥusniya Yûsuf li bal e Ḥeq raziqê vê qismetê
...
Ey *Mîm û Ḥê* xweş-defter e her çi ji min ne bawer e
Ne ji ummeta peyẋember e ne musteḥeqê şefa‘etê

7 Di nusxeyê de bi herfa “b”yê nivîsiye.

8 Di berhema Sadinî (2012: 137) de ev qesîde weha dest pê dike:
B’ çar kerîman dîn-muhkem în
Bê wech û sûret adem în
D’ kenza qidem da qidem în
Ev mesele rast li we tê
Di berhema Yıldırım (2014: 102) de jî bi heman rengî ye.

9 Menzûmeya Zenbîlfiroş di vê mecmû‘eyê de herçiqas 51 beyt bin jî lê di xebata Yıldırım (2014: 148) de 56 beyt, di ya Sadinî (2012: 413) de 60 beyt in. Ji vî aliyê ve ji herduyên din hinek cudahî di xwe de dihewîne ku ew jî ji bo xebatên edîsyon-krîtîk dê bibe guhertoyeke nû.

Di vê keşkûlê de du şi‘reke nû yên Mustefa Xan Beg hatine qeydkirin ku ji wan a ewil ji wereqa 131a-yê dest pê dike û di wereqa 132a-yê de diqede. Li gor dîroka edebiyata kurdî ya klasîk tê zanîn ku ji herêma Hekkariyê şairekî bi navê Mustefa Begê kurê Mîr Ebdullah Beg heye ku bixwe jî di mîrektiya Hekkariyê de mîrektî kiriye (Hekkarî, 2011: 21-26). Herweha mexlesa wî şairî jî di gelek şi‘rên wî de wek “Pertew” yan jî “Perto” [وتـرپ] derbas dibe. Lêbelê di wan herduyan de mexlesa şair derbas nabin.

Ev şi‘ra ewil di *Dîwana Mustafa Xan* (Dîwana Perto Begê Hekkarî) a çapbûyî (Hekkarî, 2011) de piştre lê hatiye zêdekirin. Li gor agahiyên ku Doskî bi jêrenotekê daye (2011: 295) ev şi‘r di destnivîsa dîwanê de tunebûye, wî piştre ji destnivîsa Mela Mustefayê Yûsuf ew kopî kiriye ku di sala 1937an de bi sernavê “Mustefa Beg el-Hekkarî” hatiye nivîsîn. Li gor vê nusxeyê bi temamî ji pênc bendan pêk hatiye[10]. Di vê keşkûlê de jî heman muxemmes bi sernavê “Muṣtefa Xan Beg Fermayed” hatiye nivîsîn. Eger em li ser van herdu sernavan xwendineke paratekstual bikin, hingê em ê bibînin ku ew şair (Mustefa Xan Beg) di serdema xwe de yan jî di herêma xwe de bi navê xwe navdar bûye, ne bi mexlesa xwe. Lewma em dikarin bibêjin ku çapkirina dîwana Mustefa Xanê Hekkarî bi navê “Dîwana Perto Begê Hekkarî” xeletîyeke dîrokî ye. Çunkî şair navê “Pertew” yan jî “Perto” ji bo xwe wek mexles bi kar aniye.

Ji bilî van agahiyan, ev muxemmes bi behra remel û bi wezna *fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun* hatiye nivîsîn. Ji ber ku gelek ciyawazî di nav vê muxemmesê û ya çapkirî de heye, lewma em ê temamê şi‘rê li jêrê biguhêzin ser latînî.

Muṣtefa Xan Beg Fermayed

Remzeyek min dî ji tîran hate cergê min ẋedar
Du birîn bûne di qelbê min nema ṣebr û qerar
Ew çi êtûn e di dil da min dişojit pêt û nar
Kuştime çavêt di reş wan hawiran kirme kebab
Lew dinalim ez ji derdan kewtîme[11] ḫalek xerab

Ez vexendim vê digel xwe birme seyrana rezî
Ṣed hizar elwan reng(i) nîşan min dan tewwizî[12]
Ṣorgul û reyhan çîcek ṣorgulê reng-qirmizî
Ez bi vê çendê nehêlam vê demê da min şerab
Lew dinalim ez ji derdan kewtîme ḫalek xerab

Dilbicoşê serxweş im îro di weqtê seḫerê
Hawirek bada li min talan kirim vê esmerê
Ez birîndarê xedengan im ji qewsêt ‘enberê
Canê min gorî te bit îro di roja meḫşerê

10 Li gor qenaeta me, di wê guhertoya dîwana çapkirî (Hekkarî, 2011: 295) de di rêzkirina bendan de şaşî heye, divê benda sêyem bihata serî û weha bûya:

Dilbera min wê xeraman hate ser textê riqab
Wê ji dêmê xwe hilanî perde û burqû‘ niqab
Mest û mexmûr e di bezmê ew şeha ‘alî-cenab
Meclisek hingame bû saqî wekî da min şerab
Nê ji min çûbû xurûş lew hadirî ez bûm xerab

11 Di destxetê de ev peyv wek “kevtime” û “keftime” jî dikare bê xwendin, lê ji ber ku di dewama şi‘rê de bi awayekî eşkere “kewtime” nivîsîbû, lewma me ev jî wek yên li dû xwe nivîsî.

12 Weha bûya çêtir bû: Ṣed hizar elwan [û] reng nîşan[i] min dan tewwizî.

Ez bi vê çendê nehêlam vê demê da min şerab
Lew dinalim ez ji derdan kewtîme ḥalek xerab

Şi'ra nehan a vê keşkûlê dîsa ya Mustefa Xan Beg e ku di dîwana çapkirî de cih nagire û bi xêra vê nusxeyê cara ewil di kovareke akademîk de derdiçe. Şair di vê şi'rê de ji aliyê naverokê ve 'efw û bexşandina xwe ji Xwedayê xwe xwestiye, lewma jî em dikarin bibêjin ku munace'et e. Di nusxeyê de ji wereqa 132a-yê dest pê dike û di wereqa 133a-yê de diqede, bi tevahî 9 beyt in û tu sernavek ji bo vê nehatiye danîn. Paşserwa/redîfa qesîdeyê "emana min tu wî ya Reb" e û qesîde serdanpê bi qafiyeya hundirîn hatiye nivîsîn, lewma mirov dikare vê qesîdeyê di şiklê çarîneyê de jî binivîse. Herweha qesîde bi behra hezec û bi wezna *mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun* hatiye nivîsîn. Transkirîpsiyona temamê qesîdeyê weha ye:

Ez im mucrîm ti dewranê bi neṣṣa me ji Qur`anê
Bi hêvî me ji ẋufranê emana min tu wî ya Reb

Tihî-dest im ji xeyratê qewî-tirs im ji ẓulmatê
Di qebrê dan meded kê tê emana min tu wî ya Reb

Ilahî min bikey faxir Muḥemmed key li min naẓir
Di wê gavê bibit ḥażir emana min tu wî ya Reb

Bi ḥeqqê ismikey e'zem di imdada me bê herdem
Rica-xwah em tu wî erhem emana min tu wî ya Reb

Te'alellah çi xweş lefẓ e mebin qani' di her leḥẓe
'Uzir-xwahî li me ferż e emana min tu wî ya Reb

Te'alellah çi ẕat î tu şehê şîrîn ṣifat î tu
Yeqîn qend û nebat î tu emana min tu wî ya Reb

Te rûḥ da me te cism da me kemalat û 'eqil da me
[…] Emana min tu wî ya Reb[13]

Eger ez pîs eger murdar keremkara tu wî settar
Tu ẋufranî bikey iẓhar emana min tu wî ya Reb

Eger ḥeşr e eger nîran eger neşr e eger mîzan
Hemî ḥeqq in tu wî reḥman emana min tu wî ya Reb

Di dawiya munace'ta Mustefa Xan Beg de beytek hatiye nivîsîn ku mirov dikare bibêje aîdê mustensîxê vê keşkûlê ye ji ber ku îfadeya "katib" tê de derbas dibe. Mustensîxê vê keşkûlê jî, di serê wereqa 133b-yê de, wekî munace'eta Mustefa Xan Beg, di nefesa xwe ya dawî de mirina li ser îmanê ji Xwedayê xwe hêvî kiriye û beyteke bi vî rengî nivîsiye:

13 Pêşiya vê paşserwayê divê risteyek hebûya lê di vê keşkûlê de nehatiye nivîsîn, lewma me di nav kevaneka goşeyî de sê nuqte danî.

Di weqtê can tibit zail ji dunyaê dibit raḥil
Ilahî katibê ẋafil mekey meḥrûm ji îmanê

Di vê keşkûlê de wek şi‘ra dehan, qesîdeyeke farisî cih digire ku di navbera wereqên 133b û 134a-yê de hatiye nivîsîn. Eger em dîsa bên li ser vê qesîdeyê, beyta ewil û dawî weha ye:

We ṣellellahu ‘ela nûrîn k`ez û şod nûreha peyda
Zemîn ez ḥilmê û sakin felek ez ‘işqê û peyda
...
Zi serê sîne-eş Camî “elem-neşreḥleke” ber xwan
Zi mi‘rac-eş xeberdan em kê “subḥanellezî îsra”

Ew qesîdeya farisî wek a Mewlana Camî tê zanîn û di nav kurdan de gelek navdar e, çunkî ji aliyê qesîdebêjan ve gelek caran di medrese û şevên qendîlan de hatiye xwendin û hê jî tê xwendin[14]. Herçiqas tam tarîxa nivîsandina vê keşkûlê diyar nebe jî mirov dikare bibêje herî kêm di nîveka sedsala XIX-an de hatiye nivîsîn. Ew jî nîşan dide ku li gor vê keşkûlê, qesîdeya Mewlana Camî kêmzêde 150 yan jî 200 sal in bi awayekî berçav di nav kurdan de cihê xwe girtiye.

Piştî vê şi‘ra farisî, di rêza yanzdehan de şi‘reke bi zimanê tirkî di vê keşkûlê de hatiye nivîsîn ku ew jî di wereqên 134b û 135a-yê de cih digire. Me nezanî ev xezel a kê ye ji ber ku di lîteratura heyî de li ber çavan neket, lê dibe ku şairekî kurd ew şi‘r gotibe. Destpêk û dawiya wê weha ye:

Bir de gördüm tazedenin ṣuret-i enver-i güzel
Derde ṣaldı beni birden gözleri ḫumar-ı güzel
...
Ḫaber almaz hani mîhrab nice evet der canın mihrab
Sana ḳaynar ḳanı mihrab tazeden dildar-ı güzel

Encam

Keşkûl an jî mecmû‘e, di edebiyata klasîk de yek ji çavkaniyên sereke ne. Bi xêra keşkûlên nû gelek caran lêkoler rastî şair yan jî şi‘rên nû dibin, agahiyên nû peyda dikin. Ji vî aliyê ve divê xebat û lêkolînên taybet li ser keşkûlan bên kirin. Mijara vê nivîsarê jî keşkûleke kurdî bû ku li Tehranê di *Kitabxaneyê Meclîsê Şûrayê Îslamî* de di bin hejmara 87359 de bi navê *Dîwanê Şêxê Kurdî* hatiye qeykirin.

14 Di nîv-sedsala dawî de ji wan qesîdexwanan Hafiz Memdûh û Şêx Sîrac gelek navdar in ku ev qesîde xwendine. Li gor rîwayetan Mewlana Camî gava ku diçe Hecê wek hediyekê ji bo Hz. Pêxember ev qesîde dinivîse. Li wir berî ku biçe serdana Resûlê Ekrem, berî nimêja sibê, muezzînên Ke‘beyê ew qesîde ji minarê dixwîne, Mewlana Camî jî diçe ba wan muezzînan dipirse ka ew qesîde ya kê ye û hûn çawa dizanin? Çunkî gava ku wî ew qesîde nivîsiye li ba wî tu kesek tunebûye. Muezzîn jî dibêjin ku me îşev di xewna xwe de Resûlê Ekrem dît, wî jî ew qesîde bi me da jiberkirin û fermana xwendinê da. Mewlana Camî jî wê demê kelogirî dibe û fehm dike ku Hz. Pêxember hediyeya wî li cem xwe qebûl kiriye. Tiştekî balkêş e ku heman vegêrana dînî-efsûnî di edebiyata Osmanî de ji bo şair Nabî tê gotin ku qesîdeya wî jî weha dest pê dike:

Saḳın terk-i edebden kûy-ı maḥbûb-ı Hudâdır bu
Naẓargâh-ı ilâhidir maḳâm-ı Muṣṭafa’dır bu

Me di vê nivîsarê de li gor tewsîfa destnivîsan, ev keşkûl tewsîf û analîz kir, cuda cuda her şi‘reke wê tesbît kir. Di encama vê xebatê de me dît ku mustensîx yan jî danerê vê keşkûlê nediyar e, lêbelê tenê di dawiya şi‘rên kurdî de beyteke munace‘etê heye ku îhtimaleke mezin ji aliyê mustensîx ve hatiye nivîsîn. Gava me ev keşkûl serî heta binî xwend hingê dît ku devoka herêma Hekkariyê lê zal e û şairên derdora mîrektiya Hekkariyê tê de cih girtine. Em dikarin weha navê wan şairan rêz bikin: Mîr ‘Imamedînê Hekkarî, Melayê Bateyî, Feqiyê Teyran û Mustefa Xan Begê Hekkarî. Herweha di çarçoveya vê keşkûlê de eger em li gor hejmara şi‘rên wan şairan rêz bikin hingê dikarin bibêjin ku di wê serdemê de şairê herî navdar, bi çar şi‘ran, Feqiyê Teyran û piştre jî bi du şi‘ran Mustefa Xan Beg (Pertew) bûye.

Muxemmesa Melayê Bateyî û qesîdeya Mustefa Xan Beg di dîwanên çapkirî de tunene. Lewma di keşkûlê de hebûna wan şi‘ran nirxa wê zêdetir kiriye û herweha ji bo wan dîwanan bûye çavkaniyeke girîng. Xaleke balkêş a vê keşkûlê jî sernavên li ser şi‘ran bû ku li gor navdarbûna şairan hatine danîn. Bo nimûne, ji bo Mela Huseynê Bateyî, “Bate Fermayed”; ji bo Mela Ehmedê Cizîrî, “Înşaê Mela”; ji bo Mîr ‘Imadedînê Hekkarî, “Cewaba Mîr” û hwd hatiye nivîsîn. Ji bo şi‘rên Mustefa Xan Beg jî “Mustefa Xan Beg Fermayed” hatiye nivîsîn. Li ser van perawêz û sernavên biçûk me xwendineke paratesktual kir û em gihiştin vê encamê ku Mustefa Xan Beg di serdema xwe de yan jî di herêma Hekkariyê de ne bi mexlesa “Pertew” lê bi navê xwe deng daye. Lewma divê dîwana wî ne li ser mexlesa wî, lê li ser navê wî bê çapkirin.

Ji naveroka keşkûlê, ji rengê kaxezê û xettê mustensîx, dikare bê gotin ev keşkûl kêm-zêde di nîveka sedsala XIX-an de hatiye nivîsîn. Mustensîx gava ku ev keşkûl nivîsiye di kaxezê de teserrûf nekiriye û bi nivîseke gir şi‘rên xwe nivîsîne. Di navbera her risteyekê de jî bi murekeba sor xêzek hatiye kişandin ku di keşkûlan de ev cure zêde li ber çavan nakevin. Herweha di keşkûlê de du mohrên cuda hene, ev jî ji me re diyar dike ku herî kêm du xwediyê vê keşkûlê çêbûne, anku ev keşkûl di pirtûkxaneya du kesên cuda de cih girtiye. Piştre bi awayekî ketiye destê yekî kurdî-nezan û wî jî bi çend risteyan haşiye nivîsiye derbarê vê keşkûlê de. Dûre îhtimaleke mezin bi rêya kirîn yan jî berhevkirinê ev keşkûl ketiye arşîva *Kitabxaneyê Meclîsê Şûrayê Îslamî* û bi vî şiklî hatiye parastin.

Di tewsîfa nusxeyê de jî tê dîtin ku bi tevahî yanzdeh şi‘r tê de hene ew bi rêzê weha ne: Muşa‘ereya Melayê Cizîrî û Mîr ‘Imadedînê Hekkarî, muxemmeseke Melayê Bateyî, museddesa Ehmedê Xanî, du menzûmeyên dirêj (Şêxê Sen‘an û Zenbîlfiroş) û du qesîdeyên Feqiyê Teyran, muxemmes û qesîdeyeke Mustefa Xan Beg, qesîdeyeke farisî ya Mewlana Camî û xezeleke bi zimanê tirkî. Şi‘ra tirkî ji aliyê naverokê ve xezel e, nav yan jî mexlesa şair tê de tuneye, lewma me nekarî em tesbît bikin bê ya kê ye. Dîsa îhtimal heye ku şairekî kurd jî ev şi‘r nivîsîbe, ji ber ku di dîroka edebiyata kurdî ya klasîk de gelek şairên kurd hene ku bi tirkî şi‘r gotine. Di vê tewsîfê de me dît ku bi tevahî neh şi‘rên kurdî di vê keşkûlê de peyda bûn ku di paşerojê de ji bo xebatên edîsyon-krîtîk dikarin bibin guhertoyên nû. Herweha bi vê xebatê hem muxemmesa Melayê Bateyî û hem jî qesîdeya Mustefa Xan Beg cara ewil di kovareke akademîk de weşiyan. Herî dawî em dikarin bi kêfxweşî diyar bikin, bi vê xebatê armanca me ew bû ku çavkaniyeke nû ya edebiyata kurdî ya klasîk bikeve lîteratura akademîk û di cîhana kurdî de bê naskirin.

Çavkanî

Adak, A. (2009). "Şeyh Cüneyd-i Zokaydî ve Mahtut Bir Şiir Mecmuası", *Şarkiyat*, jimar 1, rr. 133-139.

Aykaç, Y. (2021). "Danasîn û Tewsîfa Mecmû'eyên Helbestan di Koleksiyona Aleksandre Jaba de", Kurdiyat, 4, rr. 23- 60.

Aykaç, Y. (2021). "Kolxaniya Veşartî: Keşkûla Qesîdeyên li dor Medreseya Mala Şêx Mustefayê Sîsî", *Ashâb-ı Kehf Şehri Lice (Tarih, Edebiyat, Kültür)*, Ankara: Sonçağ, rr. 391-406.

Bideki, H. (2018), "İran Kütüphanelerindeki Bazı Kürtçe Dinî ve Lirik El Yazması Manzumelerin Açıklamalı Fihristi", (Wer: Eral Ceylan û Veysel Başçı), *Kadim Akademi SBD*, C. 2, S. 2, rr. 208-231.

Destnivîsa *Dîwanê Şêxê Kurdî*, Kitabxaneyê Meclîsê Şûrayê Îslamî, No: 87359. (https://dlib.ical.ir/faces/search/bibliographic/biblioFullView.jspx?_afPfm=-s71vj5igb)

Develioğlu, F. (2001). *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lugat*. Ankara: Aydın.

Doskî, T. Î. (2016). *Dîwana Ehmedê Xanî*, Duhok: Spîrêz.

Doskî, T. Î. (2020), *Baxê Îrem*. (Amd. M. Zahir Ertekin), Stenbol: Dara.

Elmalı, H. (2002). "el-Keşkûl", *DİA*, (c. 25, r. 324-325), Ankara: TDV.

Feqiyê Teyran. (2014). *Divan ∞ Dîwan*, (Amd. Kadri Yıldırım), Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı.

Gökyay, O. Ş. (1993). "Cönk", *DİA*, (c. 8, r. 73-75), İstanbul: TDV.

Hartmann, M. (2015). "Li ser Edebiyata Kurdî & Li ser Melayê Cizîrî", (Wer: Abdullah İncekan), *Nubihar Akademi*, 1 (3) , rr. 119-133.

Hekkarî, Perto Begê. (2011). *Dîwan*, (Amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî). Stenbol: Nûbihar.

Karak, M. Z. (2021). Bi Mexlesa "Feyzî" Du Helbestên Nû yên Şêx Mistefayê Sîsî, *Kurdiname*, no. 5, rr. 58-80.

Kemal, F. (1970). *Kurdische Handschriften Verzeichnis der Orientalischen Handschriften in Deutschland*, Wiesbaden: Franz Steiner Verlag GMBH.

Melayê Cizîrî (2012). *Dîwan*, (Amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî), Stenbol: Nûbihar.

Qeredaxî, M. E. (1998). *Bûjandinewey Mêjûy Zanayanî Kurd le Rêgey Destxetekanyanewe*. c. I, Bexda: Çapxaney Wemîd.

Sadinî, M. X. (2012). *Feqiyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, Stenbol: Nûbihar.

Subaşı, K. (2020). "Destnivîsên Mecmû'eyên Kurd (21-22-47) ên di Koleksiyona Aleksandre Jaba (Nûbar û Eqîdeya Îmanê) ". *Kurdiyat*, jimar 1, r. 23-44.

Uzun, M. İ. (2003). "Mecmua", *DİA*, (c. 28, r. 265-268), Ankara: TDV.

Varlî, E. M. (2004). *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî yêd Mayîn*, c. II, Stenbol: Sîpan.

Yıldırım, K. (2014). *Dîwan -Ehmedê Xanî Külliyatı IV-*, İstanbul: Avesta.

Pêvek-1: Tabloya Şi‘rên vê Keşkûlê

Rêza Şi‘rê	Navê Şair	Cure	Beyt/Benda Ewil
1	Melayê Cizîrî û Mîr ‘Imadedînê Hekkarî	Muşa‘ere	Ji destê şeker-amizan seraser ẋerqê mestî me Simen-bû û dil-awizan bi reyḥanê xwe bestî me Ji tora fitne-engizan du ejder mestî gestî me
2	Melayê Bateyî	Muxemmes	Hûn li min hişyar(i) bin îro gelî yarê di min Sergiran hatine cenga ṣah(i)xendkarê di min Çar xiya û çar veşarî ṣubḥ(i) êvarê di min Merḥeba hatî xudana herdu şehmarê di min Bê li ser çavê di min tuy barê serbarê di min
3	Ehmedê Xanî	Museddesa Mutekerîr	Ey derîẋa mame tenha ez di şemsa xawerê Xan û man têk bûne ẓulmet paşî wê dêm-enwerê Paşê lêvêt wê venaxûm muṭleq ava kevserê Min nevêt dunya bi carek paşê wê sîman-perê Ger bizanim ez di ḥeşrê dê nebînim dilberê Cennetê dê pê çi kem pê wer bikem xakusterê
4	Feqiyê Teyran	Menzûme Şêxê Sen‘an	Guh bidêrîn nuṭqa ‘aşiqî da ez bixûnim vê xeṭê Ḥemd û s̱enaya Xaliqî subḥan ji şahê qudretê
5	Feqiyê Teyran	Menzûme Zen-bîlfiroş	Ey dil were dîsan bi coş carek ji camê mey binoş Da bibêm qiṣṣeta Zenbîlfiroş da seh biken ḥikayetê
6	Feqiyê Teyran	Menzûmeya Ey Av û Av	Ey av û av ey av û av ma tu bi ‘işq û muḥbet î Mewc û belan tavêt belav bê sekne û bê raḥet î
7	Feqiyê Teyran	Qesîde Bi Çar Kerîman	Ti weṣfa heyûla meḥik în ti keza qedîm da qedim în Bi wechê ku sew Rebu‘l-‘alemîn ew mesele rast li me tê
8	Mustefa Xan Beg	Muxemmesa Mutekerîr	Remzeyek min dî ji tîran hate cergê min ẋedar Du birîn bûne di qelbê min nema ṣebr û qerar Ew çi êtûn e di dil da min diṣojit pêt û nar Kuştime çavêt di reş wan hawiran kirme kebab Lew dinalim ez ji derdan keftîme ḥalek xerab
9	Mustefa Xan Beg	Qesîde Munace‘et	Ez im mucrîm ti dewranê bi neṣṣa me ji Qur`anê Bi hêvî me ji ẋufranê emana min tu wî ya Reb
10	Mewlana Camî	Qesîde Ne‘t	We ṣellellahu ‘ela nûrîn k`ez û ṣod nûreha peyda Zemîn ez ḥilmê û sakin felek ez ‘işqê û peyda
11	Ne diyar e	Xezel	Bir de gördüm tazedenin ṣureti enver-i güzel Derde ṣaldı beni birden gözleri ḫumar-ı güzel

Pêvek-2: Çend Wereq ji Keşkûla Pirtûkxaneya Meclîsê Şûrayê Îslamî



Wêne 1: Wereqa ewil û ya dawiyê di keşkûlê de (wr. 1-134)



Wêne 2: Destpêka muxemmesa Melayê Bateyî (wr. 13) û (di bînî de) herdu şi'rên Mustefa Xan Beg (wr. 132).

Kurdiyat

Yıl/Sal/Year: 2022
Sayı/Hejmar/Issue: 5
e-ISSN 2717-8315
Doi: 10.55118/kurdiyat.1121358
Rûpel/Sayfa Page: 49-70

ARİSTOKRAT KÜRT AİLELER: MÜKÜSLÜ ADİL BEG

İsmail KIRAN

Öz

Mirlik, ağalık, şeyhlik ve aşiretsel yapı Kürt coğrafyasında çok eskiden beri bilinen tarihi oluşumlardır. Bu da Kürtlerin aile başta olmak üzere sosyal, siyasal, hukuki ve askeri alanlardaki bütün tarihi yapılanmalarını etkilemiştir. 20. yüzyılın ikinci yarısından itibaren etki alanları azalmakla beraber bu yapılanma daha önce Müküs'te (Bahçesaray) mirlik, Doğu ve Güneydoğu Anadolu Bölgeleri'nin birçok vilayetlerinde ise ağalık, şeyhlik ve bunları besleyen aşiret oluşumlarının ortaya çıkardığı liderleri ile görünür olmaya devam etmiştir. Makale, Osmanlı Devleti'nin bakiyesi üzerinde inşa edilen Türkiye'de, sosyal yapısı ezelden beri mir, seyit ve "tebaa" olarak dizayn edilen Müküs ve civarında 1930'lu yıllara kadar yaşatılamayan adaleti o günün şartlarında kendi çapında yaşatmaya çalışan Müküslü Adil Beg ile ilgilidir. Aristokrat bir aileden gelen Adil Beg coğrafyadan kaynaklı ve aynı zamanda o güne kadar istemediği tarzda inşa edilen sosyal düzene itiraz etmiştir. Vurgusunu yaptığı adalet duygusunu sosyal eşkıya prototipi üzerinden inşa etmekten ziyade daha çok şiddetten beslenen geleneksel yapı üzerinde yaşatmayı tercih etmiştir.

Anahtar Kelimeler: Aristokrasi, Mir, Müküs, Adil Beg.

Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types: Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research Article

Dema Hatinê/Makale Geliş Tarihi/Received: 27.05.2022
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/: 20.06.2022

İsmail Kıran Arş. Gör. Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi
ismayilkiran@yahoo.com
Orcid: 0000-0001-8919-8145

Atıf: Kıran. İ. (2022). "Aristokrat Kürt Aileler: Müküslü Adil Beg", Kurdiyat, 5, 49-70.

Citation: Kıran. İ. (2022). "Aristocratic Kurdish Families: Adil Beg from Müküs", Kurdiyat, 5, 49-70.

Malbatên Kurd ên Arîstokrat: Adil Begê Miksî

Kurte

Mîrektî, axatî, şêxtî û eşîratî sazîyên dîrokî ne ku ji mêj ve ye di erdnîgarîya kurdan da têne zanîn. Vê jî, di serî da malbatî, di her awayî da, çi civakî, çi sîyasî, çi jî hiqûqî û eskerî, dîroka kurdan binbandor kirîye. Piştî nîveka sedsala 20em her çi qas tesîra wan kêm bibe jî, tê xuyan ku li Muksê mîrektî û li hin bajarên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê ev sazûmanîyên wek axatî û şêxtî û her wisa ya ku van xwedî dike eşîratî li gel serok û serkêşên xwe ve dewamîya xwe kirine û heta roja îroyîn jî hene. Ev gotar derheqê Adil Begê Miksî da ye ku wê heta salên 1930î hewl daye ku li derdora Muksê, ku civaknasîya wê li ser mîrektî, seyîdtî û tebaatîyê hatîye dîzaynkirin, li gor hêz û feraseta xwe tesîsa edaletekê pêk bîne. Adil Begê ku ji malbateke aristokrat tê xwestîye serî li pergala civakî ku ji erdnîgarî û heyama wî sadir bûye, rake û biguherîne. Wî tercîha xwe ya hizr û hereketa xwe ya ji bo edaletê di ser prototîpa eşqîyayê ra na, zêdebehr di ser avanîya kevneşopî ya tundîyê ra xwestîye pêk bîne.

Peyvên Sereke: Arîstokrasî, Mîr, Mikis, Adil Beg.

Aristocratic Kurdish Families: Adil Beg from Mukus

Abstract

Formations such as mirlik, aghalik, sheikh and tribe are historical formations that have been known in Kurdish geography for a long time. This has affected all the historical structures of the Kurds in the social, political, legal and military fields, especially in the family. Although its sphere of influence has decreased since the second half of the 20th century, this structuring continued to be visible with the mirlik in Müküs (Bahçesaray), and in many provinces of the Eastern and Southeastern Anatolia Regions, with the leaders of the aghas, sheikhs and the tribal formations that feed them. The article is about Müküslü Adil Beg, who tried to maintain the justice that could not be kept alive until the 1930s in and around Müküs, whose social structure was designed as mir, seyyid and "subject" from time immemorial, in Turkey, which was built on the remnant of the Ottoman Empire. Adil Beg, who came from an aristocratic family, objected to the social order, which was based on geography and at the same time was built in a way he did not want until that day. He preferred to keep the sense of justice, which he emphasized, alive through the traditional structure fed by violence rather than building on the social bandit prototype.

Keywords: Aristocracy, Mir, Mukus, Adil Beg.

Giriş

Türkçe kullanılan "bey" kelimesi "erkek özel adları yerine kullanıldığı gibi günümüzde erkek adlarından sonra kullanılan saygı sözü"nü de ifade eden bir unvandır (Anonim, 1998: 177). Eskiden bey yerine "beg" unvanı kullanılmıştır. Türkmenler beg unvanını kullandığı gibi Büyük Selçuklulardan itibaren çeşitli Türk devletlerinde de kullanılan bu unvan Safeviler devrinde eski önemini yitirmeye başlamış ve bunun yerine "şah" unvanı kullanılmıştır. Osmanlı toplumunda ise bey unvanının II. Meşrutiyet'ten sonra kullanıldığı görülmektedir (İslam Ansiklopedisi: 1992: 12). Bu unvanın Kürtçede karşılığı ise "beg"dir.

